



serokê Mazlum-Derê Yılmaz Ensarioğlu
doza Öcalan nîrxand:

Bila paşê tîbara wî jî lê venegerînin!



"Li Tirkîyeyê piştî ku bir-
yaran digirin û serokan
bi dar ve dikin, paşê
neçar dimînin ku rûmeta
wan li wan vedigerînin.
Di doza Öcalan de jî
lezgîniyeye taybet heye.
Serokê mehkemeyê
diyar dîke û hevî dîke ku
malbatên şehîdan nema
serî bo mudahîliyê li
dadgehê bidin; jî ber ku
doz wê dirêj bibe, ew jî
dê welat bixe tengasiyê."

(Doza Sedşalê:R.3)

alîyê din ê Şer an jî dengê aştiyê:
em jî zarokên xwe ji Demirel


dixwazin

■ Dayikên kurd, di vî şerî de jî her kesî bêhtir zilm
û zor dîtin, lê dengê wan jî her kesî kêmtir derket.
Lê piştî Doza Öcalan neheqîya ku li wan hate kirin
giha ber qirikê. Dayik û malbatên leşkerên tirk, bi
her awayî bûn sermijara nûçeyên televîzyonên Tir-
kiyeyê. Li aliyê din, li para dayikên ku gorê za-
rokên wan ne diyar e; koçber û şerpeze bûne û ya
girîngtir mafdar bûn, bi tenê temaşekarî dikeve. Ke-
la dilê wan gelekî rabûye. Me xwest em jî hest û ra-
manên wan ragihînin.

(Nûçe-Lêpîrsîn:R.8-9)

Di çapemeniya cîhanê de li ser dozê
nîrxandinên objektîf:

GIRTIN Û DARVEKIRINA
ÖCALAN NE ÇARE YE



Reuters

Li gorî nûçeyê ku Ajansa Reu-
tersê roja 9'ê mehê ragihandê bi-
kirên xwe, Partiya Çep a Demok-
rat a Serokwezîrê Îtalyayê Masimo
D'Alema, da zanîn ku heke Tirkîye
cezayê bidarvekirinê bide Öcalan,
dê têkiliyên Tirkîye û Îtalyayê gele-
kî aloz bibin.

Frankfurter Rundschau

Nûçeyêke şîroveyî ya berfireh di
Frankfurter Rundschauyê de hatiye
weşandin. Di nivîsê de li ser bêda-
diya dadgehê, mercên ku Öcalan tê
de ye, bi berfirehî hatiye rawestan-
din.


El Abrar

"Tîştê jî bo Tirkîyeyê herî baş, ew
e ku di vî roja ew gelekî bihêz e de,
li çareserîya kêşeyê bifikire, heke
wisa neke, dê fersendeke gelekî baş
ji dest xwe bide der."

(Nûçe:R.11)




EM DIXWAZIN
SEROKÊ ME BERDIN



Çalakî û nameyên zarokan di rûpela 12 de.

Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang@usa.net

SAMI TAN

Mij û moran hêdî hêdî belav dibe

Doza Sedçalê heta 23'yê pûşperê hate taloqkirin. Lê gotinên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hê jî têne gengeşkirin. Ango mij û morana destpêkê hêdî hêdî belav dibe. Giranî û girîngiya gotinên Öcalan hêdî hêdî ji hêla her kesî ve tê fêmkirin. Lê her wekî Öcalan bi xwe jî ji parêzerên xwe re gotiye, "Girîngiya pêşniyazên wî ji hêla gelek kesan ve, dibe ku piştî deh salên din bê fêmkirin."

Berî ku doz bê taloqkirin, dozgerên tirk dîsa doza darvekirina Öcalan kir. Ji bilî gotinên klasîk ên bi rengê, "Öcalan di gotinên xwe de ne ji dil e û ji bo rihakirina canê xwe van tiştan dibêje", hinek xalên balkêş di nîrxandina dozgeran a dawîn de hene, ku hêjayî nîrxandinê ne.

Di nîrxandina dozgeran de çêlî biratiya kurd û tirkan hatiye kirin; wekî dozên berê hebûna kurdan nehatiye redkirin. Li vê derê, divê mirov ji

samîmiyeta Öcalan zêdetir jidilbûna dozgeran û dewleta tirk hilde dest. Rayedarên dewletê li aliyekî ji bo piştaftina çand û zimanê kurdan û jinavêbirina hebûna kurdan xebatê dikin; nahêlin ku kes peyva kurd hilde ser zimanê xwe û li hêla din jî, dozger qala biratiya kurd û tirkan dike. Bi dehan rewşenbîr û siyasetmedaran ji bo çêlî hebûna kurdan û biratiya gelan kiriyê, niha di girtîgehê de ne, lê dozgerê DGM'ê ji bo raya giştî ya cihanê bixapîne, çêlî biratiya kurd û tirkan dike.

Dozger îdia dikin ku hê jî tîkiliya Öcalan bi PKK'ê re heye. Ev yek jî topavêtina polîtîkayên tecrîtê yê dewletê nîşan dide, lewre heke Öcalan di vê rewşê de jî karibe tîkiliyan bi PKK'ê re deyne, ew hêza wî ya manewî nîşanî cihanê dide.

Tiştêkî din î balkêş jî, pûçderketina gelek îdiayên dewletê bû. Li dadgehê gelek îdiayên dewletê yê li ser PKK'ê ji

hêla Öcalan ve hatin pûçkirin. Bo nimûne; êdî dozgeran jî di nîrxandina xwe de qala bazirganiya karê tilyakê, ku qaşo ji hêla PKK'ê ve tê kirin, nekiriye. Bi vê yekê, ew jî dipejirînin ku tu tîkiliya PKK'ê bi vî karî re tune.

Li aliyê din gotinên Öcalan ên li ser tîkiliyên di navbera dewletê û PKK'ê de gelekî deng veda. Her wiha Öcalan li ser van danûstandinan belgeyek jî pêşkêşî dadgehê kir. Vê belgeyê jî di çape-meniye de cih girt. Li ser vê yekê generalên tirk mecbûr man ku daxuyaniyekê bidin û danûstandinan red bikin, lê hê jî dawî li pirsên der barê van tîkiliyan de nehatiye.

Li gorî hinek kesên totikvala, heke Öcalan were darvekirin, dê Kêşeya Kurd jî holê rabe; lê gotina kurdekî a bi rengê "Dema Serokê me darve bikin, êdî destê wan ji wan re ye, yê me ji me re ye" gelekî watedar e û divê kesê yekê jî birneke, bi vê berpîrsiyê tevbigere.

Mij û morana destpêkê hêdî hêdî belav dibe. Giranî û girîngiya gotinên Öcalan hêdî hêdî ji hêla her kesî ve tê fêmkirin. Li aliyê din gotinên Öcalan ên li ser tîkiliyên di navbera dewletê û PKK'ê de gelekî deng veda.

Öcalan jî tunebûnê polîtîkayek afirand

Ji aliyê rêz û rêçikan ve; darizandin bi rêbazeke li derveyî rêbaza heyî, hate meşandin. Hefteya yekemîn bi awayê sîstema Anglo Sakson, bi mudaxaleyên mudahîlan derbas bû. Tevgerên avûkatên ku bi piranî jî aliyê hêzên diyar ve hatine hilbijartin, ên şoven, alîgirê şer û provokatîf, bûn sedema rewşeke nebaş.

AV. AHMET AVŞAR*

qaşkirin bû. Öcalan di dûmahîka hefteya yekemîn a darizandinê de, her dem nîrxandinên giştî kirin. Piraniya daxuyaniyên Öcalanê ku bi meşandina çalakiyên dîplomasiyê vekirî bo gelê xwe tê nasîn, jî aliyê medyaya rantxur a birjwa ve hatin berevajîkirin. Daxuyaniyên Öcalan ku ji 93'yan ve îfade dike, wekî ku tiştên nû ne, wekî ku ji 'tîrsa canê xwe' re dibêje hatin nîşandayin.

Ji aliyê rêbazê ve; darizandineke ne li gorî rêbaza ku tê zanîn, bi rêbazeke li derveyî rêbaza fiilî hate kirin. Hefteya yekemîn bi awayê sîstema Anglo Sakson, bi mudaxaleyên mudahîlan derbas bû. Tevgerên avûkatên ku bi piranî jî aliyê hêzên diyar ve hatine hilbijartin, ên şoven, alîgirê şer û provokatîf, bûn sedema rewşeke nebaş. Ev heqaretên wan ên li ser Öcalan û me avûkatên wî, ji hêla dadgeran ve li ber çavan nehatin girtin, nebûyî hatin hesabandin. Hate rewşeke wisa ku hinek avûkatan em bi awayekî vekirî tehdît kirin.

Daxuyaniyên dayikên leşkeran û mexdûrên şer ên di dozê de, hinek ne tê de, bi piranî dîrî rastî û çareseriyê bûn. Wisa ku kesên dihatin ser kursiyê, nivîsên ku dixwendin nivîsên jî aliyê he-man kesan ve hatibûn amadekirin bûn. Di danîşinana de çar rojan bînavber li mudahîlan hate guhdarîkirin. Bi tenê ali-

yekî şer axivî, li ser şewitandina 3 hez gund, îşkence, zilm û zor, failên meclî û qedexeyan qet nehate rawestand. Lewre di dûmahîka 5 rojan de daxwaz me ya guhdarkirina 'mexdûrên ji alî din' nehate pejirandin. Bêguman ev tekane daxwaza me ya hate redkirin bû. Daxwaza me ya guhdarîkirina navên îdiayên ku ji 1993'yan bi vir ve navgînî diyalogên veşarî yê bi PKK'ê re kirin jî hate redkirin; guhdarîkirina rojnamerên ku bi Öcalan re hevdiştin pêk anî jî hate redkirin.

Mirov tenê bi biryara încal a Dadgera ha Mafên Mirovan yê Ewrûpayê bigî dest jî, bû encama ku ji serî de dadyar nebûna wê diyar bû, derket holê. Ha fêmkirin ku ev doz nabe platforma çareseriyê ya aştiyê mezî, di navbera gel û tirk û kurd de. Têgînên di xweparastinê yekemîn a Öcalan de cih girtin "cumhuriyeteke demokratîk", "yekîtiyê demokratîk", "yekîtiyê azad" û "welateke azad" di nava qîrînen şer ên medyaya rantxur de hatin fetisandin. Destê ku ji bî aştiyê hate dirêjkirin, yekalî ma. Wî destî bersiv nestand. Lê ligel her tiştî ve peyva Öcalan mohra xwe li hefteya borî xist. "Di kîjan şertan de dibe bila bibe, ezê jî bo aştiyê biratiyê xebatên xwe bidomînim."

*Yek ji parêzerên Abdullah Öcalan e.

PIRTÛKXANEYA MEDYA

Kesên ku dixwazin pirtûkên bi kurdî û yê li ser kurdan hatine nivîsîn peyda bikin, cihê ku hûn lê digerin Medya ye.

Digel pirtûkên li ser dîrok, muzîk, erdnîgarî, ziman, wêje, huner û folklorê kurdan; CD û kasetên kurdî jî peyda dibin. Li Medyayê kampanyaya bi navê "Ji bo her maleke kurd alfabeke kurdî" didome.

Navnîşan: İstiklal Cad. Aznavur Pasajı. No: 212/3. Galatasaray/ Stenbol
Tel: 0 212 245 66 02
Faks: 0 212 245 35 90

Darizandina İmraliyê 'Doza Sedçalê' wê bi darizandineke ku bi bûyerên heta niha li dadgehan pêk nehatibûn jî bê bîra mirovan. Di serî de Öcalan, bi daxuyaniyên xwe doz ji platforma hiqûqî derxist û rengê siyasî dayê. Mirov dikare bibêje ku Öcalan di niqteyê tune de polîtîkayek afirand. Bi gotina xwe ya roja yekemîn a bi rengê "Ez berpîrsiya bûyer û çalakiyên ku di îdianameyê de derbas dibin, heta yê ku derbas nabin jî digirim ser xwe" wî da zanîn ku ew naxwaze doz bi detayên hiqûqî û lêpîrsina bûyer û çalakiyan biçê serî. Îfadeya wî ya "Ez li ser navê xwe, ji bo êş û janên ku min daye jiyandin, lêborîne dixwazim", jî bo şkandina pêla şoven û bi temamî 'peyva aştiyê' bide nî-

AZADIYA WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37
No:308
Beyoğlu/İstanbul

TEL: (0 212) 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMI TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Ses Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NİVİSGEHÊN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ İzmîr
Tel: 0 (232) 446 19 50

■ Mîrsîn
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ (Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergelî
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swîsre:
Necmi Aksoy

Tel: 41 76 372 41 18
■ Almanya:
Fener Rojbiyani
Tel: 49 228 92 51 284
■ Sweden:
Şores Reşî
Tel: 46 86 52 34 29
■ Fransa:
M. Ali Doğan
Tel- 33 60 88 63 161

■ Belçika
I. Can
Tel: 32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewzî
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv

serokê Mazlum-Derê Yılmaz Ensarioğlu Doza Öcalan nîrxand:

Bila paşê îtibara wî jî lê venegerînin!

Öcalan li ser helwesta raya giştî gotiye parêzerên
ve "Ez ji xeta xwe ya berê awarê nebûme, min xwe
xwe li roja îro anî. Tu şik û gumana min ji gelê kurd
e. Gelê kurd wê min fêm bike. Niha ez bi gelê tirk
di axivim. Ji kerema xwe re bila her kes min baş
fêm bike. Bila kes gotinên min berevajî neke."

Di şuşemîn danişîna "Doza Sed-
salê" de serdozger Cevdet Vol-
kan îdamîna Serokê Giştî yê
K'ê Abdullah Öcalan xwest. Li ser
xwaza Serokê PKK'ê Öcalan û parê-
zan, dadgeh ji her mafê parastinê bo
rojan hate taloqkirin. Me jî li ser do-
za daxuyaniyên Öcalan, her wiha çar-
erî, aşî û helwesta Tirkîyeyê, ji parê-
zerên Öcalan Doğan Erbaş û Serokê
Mazlum-Derê Yılmaz Ensarioğlu dîtin
girtin.

Ji parêzerên Öcalan Doğan Erbaş:
Parêzerê Öcalan Doğan Erbaş, bi
beşî bal kişand ser çewt-agahdarkiri-
medyaya Tirkîyeyê û da zanîn ku

Li aliyê din Erbaş pî da ser armanca
û mebesta Öcalan û da zanîn ku divê ar-
manca wî baş bê fêmkirin. Li pey goti-
nên wî, Öcalan gotiye. "Tu şik û guma-
na min ji gelê kurd nîn e. Gelê kurd wê
min fêm bike. Niha ez bi gelê tirk re di-
axivim. Ji kerema xwe re bila her kes
min baş fêm bike. Bila kes gotinên min
berevajî neke." Piştî vê yekê, Doğan Er-
baş gotinên Öcalan ên wekî "Armanca
min diyarkirina aliyê siyasî ya mesele-
yê ye. Ger min bixwesta, minê hûn red
bikirana. Minê bigota, ez endamê leşke-
rî qebûl nakim. Divê her kes pêşiya çar-
reseriyê veke", bi bir xist û got, ev go-
tin helwesta aşîperwer a Öcalan didin
der.

milê çepê Doğan Erbaş, Mahmut Şakar, Niyazi Bulgan



Öcalan gotiye parêzerên xwe, "Ez nabêjim, wê çareserî ji sedî sed pêk
were. Divê her kes bi hûrbînî rewş û rûdanan bişopîne. Ji bo çareseriyê di-
hêz û karîna min başbaş bê fêmkirin. Ev yek, wê ji aliyê Tirkîyeyê ve jî
bê fêmkirin."

Öcalan ji wan re gotiye, "Ez ji xeta xwe
ya berê awarê nebûme, min xeta xwe li
roja îro anî. Jixwe ji 90'î heya îro, kêman
zêde, ez van tiştan dibêjim." Erbaş li
ser helwesta çapemeniyê da xuyakirin
ku her çend sistema hiqûqî ya Tirkîyeyê
kevnepêst be jî, dadgeh carina ji
medyayê pêşverûtir tevdigerin. Bi bawerîya
wî, medyayê li ser meseleyê ew
baş bi civakê listiyê ku, çareseriyê me-
seleyê gelekî dijwar bûye.

Li aliyê din Erbaş da xuyakirin ku
Öcalan gotiye. Hîna tiştêkî diyar tune ye
û ev gotinên Öcalan guheztin: "Ez na-
bêjim wê çareserî ji sedî sed pêk were.
Divê her kes bi hûrbînî rewş û rûdanan
bişopîne. Ji bo çareseriyê divê hêz û ka-
rîna min başbaş bê fêmkirin. Ev yek,
wê ji aliyê Tirkîyeyê ve jî bê fêmkirin."

Wekî tê zanîn, gotûbêjên di navbera
Abdullah Öcalan û serokê dadgehê Tur-
gut Okyay de bala raya giştî kişandibû û

bûbû mijara nîrxandinan. Doğan Erbaş,
di wî warî de da zanîn ku ji belgenamê-
yên dadgehê diyar dibe ku, ji ber daxu-
yaniyên Öcalan ên li ser dîroka tirk, pa-
rêzerên mudahil û dadger şaş û meral
mane. Erbaş li ser helwesta serokê dad-
gehê ku carina Öcalan wekî muhatap û
aliyê ser hesaband jî, avahiya sistema
hiqûqî ya Tirkîyeyê bi bir xist û got:
"Ne gengaz e ku serokê dadgehê bi te-
na serê xwe tiştêkî wisa bike, ew heyî
hêzên navendî levnagere."

Serokê Mazlum-Derê Yılmaz Ensarioğlu:

Ensarioğlu der barê helwesta çap-
emeniyê de pêşin çend analiz kir. Peyre ji
diyar kir ku, çapemenî karê bîrohanîna
politîkayê resmî dike ango terîkîsiyê
dike. Ensarioğlu li ser çapemeniya îsla-
mî jî da zanîn ku çawa Kêşeya Kurd bi
awayekî subjektîf tê nîrxandin, çapeme-
niya îslamî jî xwe ji vê yekê neşuştiye.
Wî got: "Dewlet der barê hinek peyvan
de listeyêkê sansûrê diweşîne, hinek jî
bi manşetê piştigiriyê didin dewletê. Hi-
nek rojnameyên îslamî jî (Akit), ji ber
bilêvkirina hinek peyvan dikarin reaksi-
yonê nişan bidin." Bi bawerîya Ensari-
oğlu, her çiqas hinek kes jî ber dozê
bixwazin Kêşeya Kurd bê niqaşkirin jî,
manşetên rojnameyan, şewaza ku dozê
radigihînin, di rastiyê de bêhtirîn bo
bincilkirina kêşeyê ye.

Dewlet û medya meseleyê girantir dikin

Ensarioğlu şewaza li ser dozê wiha
vedibêje: "Her cara ku der heqê Öcalan
de diaxivin, dibêjin, 'Qatilê 30 hezar
mirovî', lê ew zilam ne ji ber wê, ji ber
ku serî li hemberî dewletê rakiriyê tê
darizandin. Ev nakokiyek e. Dixwazin
Öcalan li ber çavê raya giştî reş bikin.
Doz li derveyî pergala hiqûqî ya Tirkî-
yeyê tê gerandin. Tevî ku divê dadgeh
objektîf û alînegir be, Öcalan li aliyekî
dadgeh jî li aliyekî xuya dike."

Bi pey van agahiyan, Ensarioğlu da
zanîn ku divê biryar li gor wîjdanê raya
giştî bê girtin û wisa dirêjî da axaftina
xwe. "We Öcalan bi dar ve kir, wê çi bi-
be? Fatûraya bawerîya bi hiqûqê ne hin-
dik e. Bila haya her kesî jî vê hebe." En-
sarioğlu li ser aşiyê jî bal kişand ser
helwesta dewlet û medyayê û got, ev
kes, meseleyê bêhtir dijwar û giran di-
kin. Wî got, dema behsa aşiyê dibe
dewlet dibêje. "Ez terorîstan wekî mu-
hatap nahesibînim!"

Serokê Mazlum-Derê Yılmaz Ensa-
rioğlu qala rewşa heyî kir û got, "Wê
rewşa bi milyonan kesî çawa be? Bo cu-
datiyên wan û bo mafên wan de çi bi-
kin? Berî her tiştî, ji ber ku di serî de kê-
şeyê wekî kêşeya terorê dibînin, çarese-

ri pêk nayê. Bi salan e, bi vî rebazê me-
sele nace serî. Bêhtir xedar bû. îro jî we
wisa bidome. Behsa aşiyê tê kirin, lê
hîn dewlet bi insanên xwe re ne li hev e.
Hîn dewlet bi ser malên ku dibêje hem-
welatîyê min in de digire. Dev ji mafan
berdin, hîn faîlî meqûl didomin, gund
têne şewitandin û valakirin. Dîsa jî ber
ku rey dave partiyêke siyasî, kesan di-



Yılmaz Ensarioğlu

xin bin çavan."

Li aliyê din Ensarioğlu bo guheran-
dina qanûnan jî nîrxandineke balkêş kir
û wiha got: "Dibêjin em serokê terorê bi
dar ve bikin, bo kesên li çiyê qanûna
poşmaniyê derînin, bi tenê dimîne kêşey-
ya aborî. Ev dîtin a kesên ku ji binî ve
pêvajoya dîrokî fêman nekirine ye. Ma-
dem tu bi 'terorê' re rûnanê, li herême
bi dehan sazîyên sîvil hene."

Li ser tîkiliyên di qada navneteweyî
de jî Ensarioğlu diyar kir ku bi qasî ku
wî doz şopandiye. Tirkîye bi serê xwe
tevdigere. Wekî din Ensarioğlu li ser
helwesta Ewropa û Amerikayê jî da za-
nîn ku ên ku ji her kesî bêhtir li dijî îda-
mê ne, ji bo berjewendiyên xwe dikarin
dengê xwe nekin.

Ensarioğlu hevî dike ku dadger wekî
dadgeran tevbigerin. Ensarioğlu îdamên
berê yên li Tirkîyeyê bi bir xist û got,
"Mixabin li Tirkîyeyê piştî ku biryar tên
dayin û hinek serok têne bidarvekirin,
meqbûr dimînin ku rûmeta wan lê vege-
rînin (îadeyî-îtibar). Di doza Öcalan de
jî lezgîniyêke taybet heye. Serokê mah-
kemeyê dixwaze ku malbatên şehîdan
hew ji bo mudahilîyê serî li wan bidin.
Ji ber ku doz wê dirêj bibe. Ew jî dê we-
lat bixe tengasiyê." Bi dîtina Ensarioğlu-
lu, diyar e ku serokê dadgehê jî nikare
bi awayekî serbixwe û azad dadgehê
bigerîne.

NAVENDA NÜÇEYAN

Li Tirkiyeyê çekên kîmyewî ji 1915'an vir ve têne hilberandin

Li Febrîqeyên dermên jehr tê hilberandin

Labaratûwara Çekên Kîmyewî



AZAD AVAŞIN

2

Almanyayê hîn di salên 1915'an de li Tirkiyeyê li Îzmîrê di bin navê febrîqeyên hilberandina dermanan de, di hin febrîqeyan de çekên kîmyewî û gazên kîmyewî hilberandine. Îro jî hilberîn didome. Dema ku şirketên navneteweyî madeyên kîmyewî bi riyên nehênî bo Iraqê dişandin, Tirkiye wekî pîrekê bi kar dianîn. Tirkiyeyê jî ji bo vê yekê dengê xwe nedikir. Labaratûwara ku kurd tê de kobay in, hîn tê bikaranîn.

Li gorî çavkaniyan 31 şirketên biyani, 18 diravgeh û bi qasî wan jî sazgehên finansê di avakirin û sazkirina febrîqeyên ku çekên kîmyewî hildiberandin de cih girtine. Me di rêzênivîsa yekemîn de kêm be jî behsa rîsta Sowyetistanê ya di çekên kîmyewî de kiribû. Di sala 1982'yan de li dora 30 pisporên sovyetî li Iraqê bi awayekî tund li ser madeyên çekên kîmyewî xebitîne. Di heman demê de Sowyetistanê bi awayekî veşarî balafirên şer yên T-72, moşekên tanşikên û çekên kîmyewî firotine Iraqê. Piştî ku hewlên Iraqê yên bo bidestxistina çekên kîmyewî eşkere dibin, yekemîn car Neteweyên Yekbûyî di sala 1984'an de bi awayekî fermî radigihîne ku Iraq çekên kîmyewî bi kar tîne. Li gorî çavkaniyên cur bi cur Sowyetistanê piştî Şerê Duyemîn yê Cihanê 120 hezar ton gaza tabûnê digel febrîqeya wê bi dest xistiye. Her wiha Sowyetistanê tevî wê yekê li Stalingardê li dora 20 salan gaza tabûnê hilberandiye. Lê Sowyetistanê ev yek her dem red kiriye. Di sala 1994'an de nivîsarekî Kovara Moskovskî Movost yê bi navê Vîl Mîrzojanov ji ber ku di gotareke xwe de dibêje: "Rusya hîn çekên mirovkuj hildiberîne, 27 rojan di girtîgehê de dimîne."

Iraq bi şirketan re təkiliyan girê dide

Rêveberiya Iraqê ji sala 1975'an he ta sala 1980'yî bi gelek şirketan re təkiliyê datîne. Şirketên wekî; Pfavdler co. (Amerîka), NACE Corp (Fransa). Iraq ji bo ku şirketa amerîkî febrîqeyekê ava bike li dora 30 milyon dolarî pere didê. Bi vê peymanê şirketê wê di salekê de 600 ton Amîton, 300 ton Dementon, 150 ton Parvoxan û 150 ton jî Parathîon hilberanda. Lê ew peyman naçe serî. Rêveberiya Iraqê vê carê dest davêje Îngilistanê. Îngilistan jî pê re peymanê girênade. Dûre ew berê xwe dide, Hollanda û Belçikayê. Ji bo avakirina febrîqeyan kes peymanê pê re çênake. Wan dewletan diyar kiriye ku wê Iraq li dijî kesên sivil wan çekan bi kar bîne. Lewre ew pê re peymanê çênakin. Iraq di sala 1980'yî de dawiya dawî bi şirketên almanî yên bi navê SEPP û Herberger re peymanê girê di-

de û di navbera salake de li Iraqê li herêma Samrrayê febrîqeyekê çekên kîmyewî dide avakirin. Li gorî agahiyan di çekirina febrîqeyê de piştgiriyekê mezin ji aliyê şirketê WET ve jî hatiye dayîn. Vê şirketê hingî jî 11 milyon dolarî zêdetir Fosfor Trîklorîd firotiye Iraqê. Piştî ku di sala 1981'ê de febrîqeyê ava dibê, madeyên çekên kîmyewî ji Amerîka, Hollanda, Belçika, Almanyaya Rojava gihîştibûn destê Iraqê.

Di sala 1982'yan de febrîqeyê almanî ya bi navê Feber madeyên kîmyewî yên ji bo çekirina gaza xardalê dişîne Iraqê. Li gorî çavkaniyan heman şirketê jî bo Hîtlêr jî gaza Sîyonîdê (ZykonB) çekiriye. Hîtlêr bi wê gazê hezar cihû jehr kirine. Van şirketan di sala 1985'an de bi navê "Projeya 33/85"an 17.6 ton Fosfor Trîklorîd daye Iraqê. Di wê demê hemû madeyên kîmyewî bi rîya Tirkiyeyê gihîştine Iraqê. Ew febrîqeyên çekên kîmyewî li Iraqê di bin navê febrîqeyên hilberandina dermanan de (ilaç) hatine avakirin.

Şoreşa Îslamî berê napalman da kurdan

Humeynî bo Şoreşa Îslamî pêk were ji kurdan piştgiriyê dixwaze. Hîn kurd jî tesîra karesata Halebçeyê derneketibûn Humeynî piştî şoreşê, li dijî kurdan bi awayekî hovane tevgeriya, hemû gundên kurdan ên li ber sînor da ber bombeyên napalmê. Li gorî çavkaniyên wê demê bi hezaran kurd jî cih û warên xwe bûne, gelek jî bi wan çekan hatine kuştin. Îran jî wan çekan berî ku şoreş pêk bê ji Amerîkayê distîne. Di dema Şah de peymanek bo danûstandina çekên nukleer bi Washingtonê re hatiye girêdan.

Tirkiye û çekên kîmyewî

Tirkiyeyê di warê çekên kîmyewî de destên xwe ji gelek welatan zûtir girtiye. Hîn di salên 1915'an de Almanyayê li Tirkiyeyê febrîqeyên çekên kîmyewî ava kirine. Di wan febrîqeyan de kîmyagerên alman xebitîne û tirk hînî bikaranîn û çekirina wan çekan kirine. Dewleta tirk jî di Serhildana Dêrsimê de wan çekan bi kar tîne. Ligel ku dewleta tirk Peymana Sewrê û xala 76'an a qedexekirina çekên kîmyewî û her wiha Protokola Cenewreyê jî pesend kirine jî, wan çekan bi kar tîne. Di vî warî de Dr. Nûrî Dêrsimî wiha dibêje: "Bi bombeyên gazê ku bi topan û balafirên berdidan ser herêmên kurdan, mijekê tarî radibû û her



çiqaş mirov hebûya ji ber wê gazê jiyana xwe ji dest dida." Der barê wan çekên kîmyewî de ne tenê Almanyayê, li gorî çavkaniyan Amerîkayê jî gelek endamên artêşa tirk li ser çekên kîmyewî perwerde kirine. Li Îzmîra Tirkiyeyê bi tenê di sala 1972'yan de di febrîqeyên çekên kîmyewî de 63.500 ton gaza Etîlen hatiye hilberandin. Di sala 1974'an de hilberandina wê gazê derketiye, 200 hezar tonî. Li aliyê din li gorî agahiyan di sala 1989'an de li herêmên cur bi cur bi qasî 40 cihî li gorî xwesteka NATO'yê 489 bombên atomî hatine bicihkirin. Bi giranî li herêmên ku kurd zêde ne hatine bicihkirin.

Piştî 1984'an jehr bi Tirkiyeyê xwestir hat

Ji ber sedema ku PKK dest bi şerê çekdarî dike, dewleta tirk di sala 1984'an de bala xwe baştir dide ser çekên kîmyewî. Hîn di wê salê de dewleta tirk dest bi hovîtiye kiriye. Wekî mînak li Dihê jehr avêtiye nav bîran û kaniyan. Bi vê yekê gelek kes bi nexweşînen giran ketine. Li gorî çavkaniyan di

sala 1991'ê pêşî li Golan (Göle) Qersê, di re jî li Merezê dijî gerilayê ARGK'ê bombeyên napalmê bi kar tîne. Dige van herêman herêmên wekî Amed, Xerzan, Serhat û Botan li dijî gerilayan gelek caran bombeyên napalmê û çekên kîmyewî hatine bikaranîn. Li dora gundê Çermâ Çewligê jî di 24'ê rezbera sala 1998'an de di encama bikaranîna çekên kîmyewî de 23 kesan jiyana xwe ji dest dabû. Herî dawî li Şerxê di encamê bikaranîna çekên kîmyewî de 20 hep gerilayên

ARGK'ê jiyana xwe ji dest da.

Li gorî çavkaniyan febrîqeyên li Tirkiyeyê bi taybetî li Stenbol, Îzmîr, Adapazarı, Gebze, Îzmîr û li aliyê Trakyayê hatine avakirin. Ev febrîqeyên wêkî febrîqeyên dermanan xuya dikin. Li ser van rûdanan di 22'ê gulana sala 1999'an de albayekî ku ji artêşa tirk malîşîn bûye, wiha dibêje: "Bi giştî alman şîrikê wan febrîqeyan in. Di febrîqeyên ku hilberîna dermanan tê kirin de, gazên jehrîn tîne hilberandin. Ew gaz jî ji aliyê Artêşa Tirk ve li dijî kurdan tîne bikaranîn. Bi gazên jehrîn ên Almanyayê kurd tîne qetilkirin." Di peydakirina gazên kîmyewî de wisa xuya ye ku dewleta tirk bi welatên wekî Fransa, Îngilistan, Swîsre, Amerîka û Almanyayê re təkiliyên xurt girêdane. (Qadiya)

Çavkanî:

- 1) Ortadoğu, Alian Gresh-Dominique Vidal
- 2) Özgür Gündem, cîlda 1992'yan
- 3) Özgür Ülke, cîlda pûşpera 1994'an
- 4) Li Kurdistan û Rojhilata Navîn Çekên Kîmyewî, Biyolojîkî û Atomî, Dr. Celadet Çeliker
- 5) Halebçe Katliamı, Weşanên Varyos

Gotin û qalibên di Siyabend û Xecê de

SAMÎ BERBANG

Di berhemên zargotîni de gelek biwêj û şayesên balkêş çih digirin. Dema ku mirov bala xwe dide wan berhe-dewlemendî û bedewiya zimanê gel da-awan dibe.

Me dil heye ku di vê nivîsê de li ser zî-berhemê gelêri rawestin. Ev berhem pirtûka bi navê "Siyabend û Xecê" ku ji la lêkolîner Ahmet Aras ve hatiye nivisan-e. Aras destana navdar a kurdan ji nava berhev kiriye û piştî ku sê çar guhartoyên man destanê dane ber hev, ew pirtûka ni-andiye. Li vê derê mijara me ne ew e ku wê ji aliyê wêjeyî ve binirxînin. Em li ser manê wê rawestin. Her wekî hemû ber-mên bicureyî gelek gotin û biwêjên balkêş nava berhemê de çih girtiye.

Dilkevir: bêwijdan
Apê siyabend merivekî nebaş û dilkevir

Kirtol: bermahiyên nên (ekmek kirintist)
Xurê wî kirtolên binê teştê bûn.

Lêhêrsketin: lê qehirîn. Amojin lê hêrs et


Navtêdan: fitkirin
Paşê nav di mêrê xwe dîda

Çavlêsoyê: ji bo ravekirina rewşa şên ku zehf bi hêrs dikevin hatiye bikara-

Dilq: timtêl, qalib
Siyabend ji dilqê insanan derketibû.

Di dilqê rewilê çolê da bû.

Gune pê hatin: dil pê şewitîn



Gunê hinekan pê dihat, nanek didayê.
Tor tor geriyân: beredayî geriyân.
Amojnê got: Ez naxwazim ev li pêş çavên min tor tor bigere.

Gefgirtin: rik û kîn girtin (kin beslemek)
Siyabend gef digirt li Felekê

Tilorbûn: gindirin, totbûn.
Ji serfêza newalê keviyek tilor bû.

Rik kutan: rik berdan, rik lê girêdan.
Ap û amojnê mîna dijmanan rîka xwe ku-tabûnê.

Ji bo kesên belakir ji gotineke wiha hati-ye bikaranîn:

Meriyê ku bi perekî xwe tê da, bi çil pere-yî xwe jê xilas nedikir.

Lêderketin: pê ve xuyakirin

Sîwarekî xerib li wan derket ango sîware-kî xerib bi wan ve xuya bû.

Di xwinê de mewijîn: di nava xwinê de mayin.
De wa ye ser û guhên lawîk di xwinê da mewijîye

Hilqetandin: hilkirin, jêkirin.
Tevê hustiyê wî hilqetanda

Çavnebirin: pê nekarin (gözü kes-mek/gözü kesmemek)

Çavê apê ji mêrik nebiri.

Çavpêketin: dîtin
Bila çavên min bi te nekevin (gözüm gör-mesin seni)

Bi ber çavan ketin: di ber çavan re der-bas bûn (gözüne ilişmek)

Piştî xwe dayê û lê xist çûyin: sirtinî dö-nüp gitmek

Cizirandin: çewsandin
Wana ez cizirandim, zîlm li min kir.

Ji çavê yekî reşe vehatin: gözleri karar-mak

Ji birçîna ji çavê wî reşe vedihat.

Sermakirin: üşümek

Perê gund: diyarê gund, dora gund

Berî yekî dayin: bi pey ketin (kovala-mak)

Av li yekî germ bûn: rewşa yekî xweş bûn

Yekî ku hinekî av lê germ bibûya û xelkê jê hez bikira, xwe pê bigirta, Hesenê Qelb tişteki dîanî serê wî.

Xwepêgirtin: pê sekinîn (tutunmak)

Li peşiya yekî dest danîn: serî jê re te-wandin.
Min li pêşiya wî dest dananî.

Bi ber xwe ketin: xemgîn büyin
Zêde ber xwe nekeve.

Mildayîna hev: alikariya hev kirin.
Mil bidin hev.

Gurê kirin: guh lê kirin, bi ya wî/wê ki-rin.

Dest dibin xwe: li ber xwe didin, ji dest-hilaninê neketine.

Çavlêgerandin: lê nihêrtin (gözetmek, göz gezdirmek)

Divê bê gotin ku hinek kes peyva "göz at-mak" li kurdî vedigerînin û dibêjin "min çav-vek avêt filan tiştî" ev gotin ne rast e û dîrî mantiqê kurdî ye.

Xwe dirêjî tişteki kirin: ajotina ser tişte-ki, êrişkirin

Siyabend xwe dirêjî kon kir.

Çavên xwe kutan çavên yekî/yekê: çavên xwe berdan çavên yekî/yekê (gözleri-ni birisinin gözlerinin içine dikmek)

Fena: mîna

Teher: şêwe, awa

Aqar: herêm, dever

Kewdîtina birinê: kewîna birinê, kew-girtina birinê

Xikûxalî: vit û vala

Bînayîn: dîtin
Kesî tişteki wisa dîtiye û binaye

Xiz: çakîl

Xizên devên çeman

Rewil: lawir

Şayîş: fikar, meraq

Xema neke, tu şayîşa nekişîne

Şev kire roj, roj kire şev: bi tirkî dibêjin, 'yemedi içmedi'

(Dêbidome)

Kirmanşa şaredêrînekey Rojhilat

DR. HUSEYNÊ XELIQÎ



Şarî Kaxusrew û Dadeşêrîn û mel-bendî şwênawarî şariştaniyêti konî kurdan, nawendî şwênawarî derîney madî le Bêstûn û Pataq û Hersîn Taqbostanî şwênî pencey Ferhadî şeydayî Şêrîn û Pêtextî hawîni Sasaniyekan û nawendî emareti Zengenekan. Dûrêyaney lêkgirêdanî ferhengekanî nawçey Rojlihati Nawerast, yekê le şare pirheşimet û he!e gewrekanî Kurdistan e. Em şare be dû ho û legel şarekanî dîkey Kurdistan da cawazî heye:

1-Zorbey danîştwanî Kirmanşah şehe û hawrêbazî ayîni desthelat-darekan û zorbey danîştwanî Êran in. Ferhengî şêhîgerî le wê de pir xawen birew e. Xelkekey be zaraway goran depeywin û le axawtin de zor le zimanî farişî kelk werdegirin û lew barewe kemtir hest be çewsanewe dekin!

2-Le ser rêgay transîti bazirganî Êran-Iraq- Sûriye û Urdin, Turkiye helkewtiwe û le konewe em şwêne bo seqamgîrkirdinî desthelat û barî bazir-ganî le Êran de nirxî hebuwe. Her boye le senetîkirdinî wilatîş de beşekî ber-kewtiwe û ta radeyek wek şarekî niwe-senetî berçaw dekewê. Piley şîurî komelayetî û xwendewarî zorî tê de helkewtiwe. Le mêje zankoy heye û hêle coraw core zanistî û hunerî û komelayetiyekanî tê de şî dekrêtewe.


Bew haleş lem şare da, konewe şerî demargirjaney şîha û sîni, be radeyekî zor xelkî be xoyewe serqal kirdiwe. Û le nawan kurdî sîni û kurdî şîhe de pêwendî birayane berçaw nakewê. Emeyş hemîşe wîstî desthelatî nawendî buwe û le her çeşne cawaziyekî lawekî û kemreng bo têkdanî rîzekanî xelkî Kurdistan kelkî wergirtiwe. Le ber em cewaziye perepêdirawe, lem şare da hestî netewayetî yan her niye yan kiz e. Tenya le derewey Kirmanşah û le katek da kurdek penayan bo berê, demarî kurdayetiyen we cim û col dekewê û lew perî fidakarî da, piştîwanî lê dekin û be kurdbûniyan şanzatî dekin. Her

boye le nêw şarexeyrekurdekan da kes nawêrê sîkayetî be kurd bika. Diyarî heşimetekî berçawî sîniş lew şare da ye ke ziyatir le kurdeşîhekan legel sîtemî netewayetî û ayinî da aşnan. Ewan le ber kembûniyan zortir le kur-dekanî dîkey Kurdistan le şarekanî xoyan da hest be sîteme dekin. Lem diwaniyane da mela Rebîhî lew-pênawe da be destî rejîmî axundî kujra. Le serhildanî şerê sêmenge da ke le Pawewe destenapakekanî ser be Sawakî Şah û Behs demargirjî ewaney le bin alay nadadperwerî îslamî axundî da sîneyan dekuta awrekeyan xoş kird, xelkî şarî Kirmanşah be qazancî kurd hîç dijkirdeweyekiyen nişan neda û lew pêwendiyê da amadebûnî xoyan bo şer legel birakaniyan rageyand. Be gotrekarî danîştwanî Kirmanşah û dewr û berî 2 milyon debîn. Beşekî zorî wek beşekanîtir Kurdistan be karî kişt û kalewe xerik in. Le ber ewe şareke xawenî çend karxane û binkey palawt-inî newt û hitire, hendek kirêkarî seneetî tê da ye.

Di gulê vînîkerdey

Edip û Orhan

6'ê meney (aşma) pûşpera sera binçim de vînîkerdîne Edip Aksoy û Orhan Cingöz a pancinan. Di nê rojan de min Edip û Orhan, dewey Zenge û şarê Zenge, zey ke şerîdê filmî ke verê çimanê kiçi ro (merdimî ra) derbas bibo, verê çimanê xo ro derbas kerdî. Dîrokey Zenge, weşîkî Zenge gelêke çî nîşanê merdimî dana. Bi awayêkew bîn, merdim eşkeno vaco xayintîyeke di dîrokey Zenge de bî, di nê serewedayîno peyîn de jî bî û başîkey dîrokey Zenge de bî enî seran de reyna xo dubare kerd. Zey nimûnî: Wextê Serhewedayîne Şêx Seîdî de dewijê Zenge sebo mirûdê Şêx Selîmê Hezanî bî di miyanê Serhewedayîne Şêx Seîdî de ca nêgirot. La belê gava eskerê Şêx Seîdî di dewey Zenge ra derbas bîne û şîne



Orhan Cingöz

Zenge, Licok û Huseynîge di vernî de yenê vîrê merdimî. Ma wazenê tiya serê dewey Zenge û şehîdanê Zenge de vînderin. Dewey Zenge heya serey 1993'ê di miyanê dewanê Licey de ê tewrî hûtan de cay xo girotbî. Reyna di hetê hetkarîna gerîlayan de jî, di miyanê dewanê ke veng dabî de, cay xo girotbî.

Zenge gerîlayan rê zey kêcinan bî. Çi çax îhtiyacî gerîlayan bibayne, bi rehetî eşkayne şorê Zenge, îhtiyacî xo bivîne û ageyrê. Reyna şarê Zenge jî a çaxî henî bi ters û henî jî bi dil û can înanî germî bî. Di enê germî de, di serey 1992'î de henî xortê tewrî refê gerîlayan bî. Di eynî sere de Zenge şehîdê xoyo joyîn (verîn) da. Di aşmey sermawezî ya 1992'î de Mizgin Tekin (Sîpan) koyê Pasûrî de şehîd kewt. Di

aşmey adar a 1993'î de Menaf Kaya teberê dew de ke caykew miyanê dewey Zenge û Heihelî de yo, heta eskeran ra hame kîştin. Di may şehadetey Menafî ra Herman Cingöz, Cemal Balta, Fetah Balta jî dewey Zenge ra tewrê miyanê refê (qefleyê) şehîdan bî. Di tenê ke miyanê şehîdan de cay xo girot jî Edip Aksoy û Orhan Cingöz ê. Di serey pancinan a vînîkerdîne Edip û Orhanî de ma wazenê henî serê jîyaney înan de vînderê.


Edip Aksoy di serey 1964'an de di Zenge de hame dinya. Ew tutê famîleykew dewlemend bî û di miyanê bîray û wayanê xo de, di rêzey diyînan de bî. Edip bi vatinên pîrikey xo ke çirê qalê serhewedayîne Şêx Seîdî kerdê, şiyar bî. Edipî her gam waştene serê niganê xo de reyra şoro û binê tesîrê joy de nêbo. Semedê ene joy ê û famîley cê bi jobînan nêkerdê. Di qîcî xo de sere vernîya famîley xo dart we û şî bajarê Edene. Gelêke wext di bajarê xerîban de mend. Xeynê Edene bajarê Tirkiye ê zey Stenbol û ê

binan ra jî geyrabi. Edip Aksoy jîyaney xo de gelêke zehmetî ant. Dimara ageyra dew û bi îmkananê xo zeweciya. Reyna di heman wextî de nêweş kewt. Di enê nêweşî xo de gelêke zehmetî ante. Di ene zehmetî êde hevaley cê gelêke paştî da ci. Merdim eşkeno enî zewacê cê di miyanê merdimê kew di dewe de zeweciya bî de zewacêkew hemdem bihisebno. Semedo ke zey dewijan nêhawinaynê zewac ra û zey dewijanê binan qet heqaret ro hevaley xo nêkerdene. Zeg Edipî vatê reyke tenî înan dabî pêro. Reyke ke gerîlay nêwe hameyne dew û dewijan pê nêzanaynê, Edip înan di keyyê de vînenê. Ewneno solê gerîlay ke dirnayeyê û nigê cê tera aysenê. Ê jî ew roj di Amed de solêke newe girote bî û hamebî dew. A soley xo veceno dano gerîla û soley ê wa kane keno nigey xo û yeno keye. Hevaley cê tera persena ke soley cê çiyawa, ew teravano min dawa gerîlayan. Hevaley cê wazena tedir biherediyo, la ew vano: "Ena dewa de ez serkerî ti qisey min meke, weko bîn ti vana çî ti serbest a." Di dew de herkesî Edipî ra hes kerdêne. Edip merdimêkew biaqil bî. Ê çapemeniya tirk, kurd û ê dinya jî baş teqîb kerdêne. Her wiha Edip wendoxêkew baş ê rojnameyê Welat û Welatê Me bi. Ey her hefte rojname girotêne û serde bi wendîndertêne. Gelêke wext jî rojname ji famîle û hevalanê xo rê jî wendêne.

Edip heta binçimkerdîno peyîn, bi desan rey hame binçimkerdîno û semedo ke nêşkayne çike serde tespît bikerê, bêçare ew vera dayne û ew tehdît kerdêne. Her ku Edip vera dayn, hameyne rewşey xo yê binçim de xortan ra vatêne ke ê jî gama bêrê binçimkerdîno bizanê çawey hereket bikerê.

Orhan Cingöz di serey 1973'ê de hame dinya. Di germiya 1990 de

Di 6'ê pûşperî de Edip û Orhan di Beyray Koy (Dağ Kapı) ê Amedî de qehweyke ra hetê çende tenê ke di destê înan de bêtelî (telsiz) bibî yenê binçimkerdîno. Ew roj ra heta enka joy înan ra xeberê nêgirotê.



Edip Aksoy

dewey Zenge girotebî miyanê xo Orhan jî girot bî miyanê xo. Orhan beyray xo her gam şervanan rê akertî û înanî şîne û hameyne. Orhan tewrê şer nêbî la belê xususiyetê ê yê eskerî bibî. Merdim eşkeno vaco, ger tewrê şer bibaynê ga bibo serleşkerêke baş Qando ke tewrê şer nêbî jî çî amaynê serê milê cê ardê ca.

Di serey 1993-94 de ke zordariya dewlete serê dewijan de bî zehfê kê Edip û Orhanî jî kê xo dewra bar kerdî şî bajarê Amedî. Di Amed de jî ne Edipî û ne jî Orhanî tîkîlî xo bi şervanan ra qut nêkerde (nêbirna). Di Amed de jî çî di destê înan ra ameynê ardê ca. Heta 6'ê pûşperê, serey 1995'î de hamey binçimkerdîno û heta ewro jî nê joy xeberê ke înan ra girote û ne jî tirmê înan di. Di 6'ê pûşperî de Edip û Orhan di Beyray Koy (Dağ Kapı) ê Amedî de qehweyke ra hetê çende tenê ke di destê înan de bitelî (telsiz) bibî yenê binçimkerdîno. Eno binçimkerdîne înan henî tenî vînenê, jî la famîley Edip û Orhanî her çiqay ke bi dîlekçeyan ser da dozger û emniyetî jî, înan qebûl nêkerdî û hema neysenê.

CEMİL ANDOK

LI NÇM'ê ya İzmirê

● 12.06.1999 şemf

Fîlm: AX (Ev bernamê wê li EKM'ê were pêşkêşkirin)

saet: 18:00

● 13.06.1999 yekşem

Konsera Hozan Cezmî, saet: 17:00

● 18.06.1999 în

Konsera Koma Azad, saet: 17:00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



LI TOHUM'ê

● 12.06.1999 şemf

Danîşana Ax û guftugo, saet: 17:00

LI YÇKM'ê

● 19.06.1999 în

Konsera Koma Kevoka Şîn, saet: 17:00

LI BEKSAV'ê

● 20.06.1999 şemf, Konsera Koma Amed, saet: 18:00

li Tirkiyeyê qedexe, li derve xelat


AX'ê xelat stand

Navenda Çanda Mezopotamya bi şaxên xwe yên li İzmir, Edene, Mêrsîn û Amed (Amed niha girtî li Tirkiyeyê û Kurdistanê, li ser pêşkêşiyandina çanda kurdî dixebite. Ji ber êkê jî zor û zehmetiyên dewletê jî li kêr nabin. Hê jî salona çalakiyan a endê û çend salonên şaxên wê, girtîne. û zehmetiyên li ber xebatên wan ên li sinema, şano û muzîkê jî didomin.

AX fîlmê yekemîn e

Beşa sinemayê ya NÇM'ê sala par bi Ax, kurtefilmekê kişand. Ji sinemaya gelek kesên navdar tevî galaya vî kurmê bûn. Ji ber ku dewletê rê neda vî fîlmê ku tevî mihrîcanan bibe, li ser vî fîlmê gelek nîqaş çêbûn. Fîlmê Ax nek berê di 11.mîn Mihrîcana Navneteyî ya Filman a Enqerê de ku di navbera 8.gulan-9'ê pûşperê de pêk hat, ji baziyê hate derxistin. Wekî sedem jî beroka wê ya 'xeternak' hate ditin.

Ax, tevî mihrîcana (festival) ku li Mişîna İtalyayê pêk hat. bû. Ev mihrîcan navbera 3-6'ê pûşperê de pêk hat. Di vî fîlmê de nêzikî 600 fîlmî tevî pêşbirka sinemayê bûn û Ax jî di nav de, 40 fîlmên kinemayê bêsaziyê hatin hilbijartin. Di çar salên mihrîcanê de Ax du caran hate nîşandana wê di dawîya mihrîcanê de Ax, di nav fîlmên de yekemîn hate pejirandin û xelata COR-METRAGGIO'ê ye ku beramberî 2 mîlyon lîre italyayê ye hate xelatkirin. Xelata KE OMRÎ-For Example ku ji aliyê sazîya



Associzione Aprile ku amadekarên mihrîcanê ne tê dayîn jî fîlmê İsrailî girt.

Her wiha Ax wê di 15-20'ê pûşperê de tevî pêşbazîya 15.mîn Mihrîcana Fîlmên Kin a Navneteyî ya Hambûrgê jî bibe.

SERWİSA ÇANDÊ

Xaniyê Gel li Kolnê ye

Yekademiya Çand û Hunera Kurdî (AÇHK) 'Xaniya Gel' li Kolna Almaniyayê li navîşana Anderschanz Richlerane, Jugend Herberge vekir. AÇHK'î di gelawêja 1997'an de û gulana 1998'an de jî dîsa Xaniyê Gel vekiribû û ev xebata wan gelekî bala kurd û dostên kurdan kişand.

Xaniyê Gel her sal diroka dewlemendiya çanda kurdî radixe ber çavên kesên ku tîna temaşeyîna wê. Xaniyê Gel di salên çûyî de maketên Çiyayê Nemrûd, Pira Mala Badê, Keleha Amedê, Xaniya Yado û hwd. çêkiribû û îsal, ji xeynî ven maketan, maketên çiyayê Ferat û Şîrîn ku li Rojên Çiyayê Kurdistanê ye û maketa Saraya İshaq Paşa jî wê di nav Xaniyê gel de cih bigire. Di Xaniyê Gel de, di nav hefteyê de wê axaftinên ku zêde li ser nasîna Almaniyayê ne wê bê kirin û di nav hefteyê de jî bi giştî Şanoger, hunermend û dengbêjên kurd wê hunerê xwe pêşkêşî gel bikin.

Çalakiya Xaniyê Gel wê heta 20'ê pûşperê bidome û wê di vî demê de li ser dewlemendiya kurdî û diroka Kurdistanê herêm bi herêm bê rawestandî.

Wekî her sal îsal jî bi organizîyaya balyozxaneyên tirk, faşîst hatin ku xebata xebatkarên Xaniyê gel asteng bikin.

SERWİSA ÇANDÊ

ÇAVDÊRÎ

Soz bi peymanê ve kelijê



SERKAN BRÛSK

Roj bi lez bû. Dijmin bi lez bûn. Heval bi lez bûn.

Berî niha bi yanzdeh salan bû. Şevê ji şevên bi xirecir bû. Nêçîrvanên kuştinê, derketibûn seyda hêviyên jiyane.

Egîdekî kal, li pêşîya hêviyên axê, bi wan çavên xwe yên ku pêncî û du salan çavdêriya giyana jiyana bindest kiribûn û birek ji temenê xwe dabû azadkirina jiyane, tarîfî diqelaşt.

Çar salên di pêxêra çiyayên Omeriyan de, çar salên li ser sîngên deştên welêt, çar salên di binerdkan de, çar salên destpêkê, yên ji êgir û pêtan pêk hatine, dikin di vî şeva destpêka pûşperê de biqedin. Şeva pêncê pûşperê bextikê xwe qulipand û Delalê Pilingê Serê Kaniyê xesirand.

Çiya di halê xwe de digiryan. Ji her du çavên kaniyên newalên tarî, rondik bi buqînî diherikin, ser hinarkên çiyê. û li ser kortikên rûyê wê dibûn gol.

Tirêjên dawî yên roja li ber ava, xwe di nava pelên Çinarê re berdabûn ser rûyê ava golê. Tirêjên dawî yên roja madzer di kûraniya kaniyê de difetisîn.

Roj di pişt çiyayê de xerq bûbû. Tarîtiyê ew daqurtandibû.

Şev jî, ji şewq û ronîya heyv û stêrkan mehrûm bû. Ewrê bêbaviyê, ezman perde kiribû. Destê erd û ezmên ji hevdu qut kiribû.

Ewran ava reş bi ser çavên dinyayê de barandibû. Perdeya çavê cihanê helandibû. Giraniya tarîtiyê xwe bi ser çiyayên Omeriyan de pelixandibû. Panav, guherk û mextelên çiyayên wê di bin giraniya tarîtiyê de dihejhiştin. Zinarên bilind ji tarîtiya şevê saw girtibû. Teba û ajeleyên kovî xwe di qul û qewerên çiyê de pîrnisandibûn. Tarîfî bi bédengîya guran xayintir dibû.

Xayintî li her deverê melisibû. Xwe avêtibû pişt kevîrê hestepî, di nava kevîrên rizdeyan de bû, li binya mîwekê bû û guhên xwe mîna guhên marê kor bel kiribûn û li pêjna rîbatên zinaran dihiştin.

Serê Kalo xuya kiribû. Xwe hêdika nêzikî benê kiribû. Guhên xwe dabûn pêjnan. Cihanê xwe ker kiribû. Ba hatibû qeyd û bendkirin. Pelên mîwên Omeriya nedilebitin. Ajeleyên çiyê bi bédengîyê mirinî li benda herka xwîne bûn. Êdî saniyeyên dawî jî qediyabûn û şehadet...

Berika ewil li hedefê bû. Li çepê ketibû, rast firiyabû. Lê birîndar ne naşî bû. M. Letîf Yıldırımê Omerî bû. Şerûte rojên teng bû. Yek ji kedkarên hîmdarê şoreşê bû. Ji Bakur bû lê di dilê hemû Kurdan de hêvî bû. Sozgirtê heta dawî, cangoriyê peymanê rizgariya xakê, deqê eniya niştîman bû.

Di dema ku berikan qeweta bedena wî talan kiribû de, bedena wî gêr bûbû nava zebaniyên daristanê. Çeka wî ya ku çar salan di nava kefa destê wî de hêlîna xwe çêkiribû, firiyabû. Mefer nemabû. Neqeb teng bû. Dil dikir xwe li behîşiyê deyne. Navber nemabû, daketibû şûxlê destlepêkê. Narincok û serî hatibûn hemberî hevdu. Çav tarî bûbûn.

Êdî soz bi peymanê ve kelijibû. Ji peyvê xwîn dîniqutî ser erdê; Ruhê min di erdê de ye, diroka min jî, lewra, diherikim ruhê xakê.

ALIYÊ DIN Ê ŞER AN JÎ DENGÊ AŞTIYÊ:

Em jî zarokên xwe



FATMA YILDIZ (50):

Qîza min Nafiya Yıldız (Mizgîn) li 1994'an li Batmanê şehîd ket. Ew li Batmanê hate girtin, 30 rojan îşkence lê kirin. Kirin nekirin, tiştê li xwe dananî. Dawiyê ew li pey panzerê girêdane û kaş kirine. Peyre dewletê got me, "Zarokên we ketine qula teroran, mayin tê de teqiyane." Em çûn ku termê wê bînin, me dît ku her tişt pê kirine; diranê wê rakirî, pêşîrê wê jêkirî, laşê wê şewitî. Kûçik jî bera dabûnê.

Dema Serok hate girtin, em rûniştin giriyan. Me got wê qiyamet rabe. Lê Xwedê

ji gelî misilmananan razî be, hinekî ker bû, sekinî. Dema ev lihevhatina hanê çêbe, wê zaf baş be; hem ji me re hem jî ji tirkan re. Em xelasiya Apo dixwazin. Em lihevhatin û aştiyê dixwazin. Em nexwazin dayikên şehîdan hêstiran bibarînin. Bi hezaran şehîdê me hene, bi hezaran me îşkence û tadehî dîtine. Em 15 rojan di îşkenceyê mane. Em koçber bûn, gundê û malê me hatin şewitandin. Avêtin ser mala me, gotin, "Hûnê mehê du kilo şekir û paketek çay bînin." Em li ber tavê hiştin; ji 8'ê sibe heya ku mele bang da. Lê dîsa jî em lihevhatinê dixwazin.

Bes e. Bi hezaran... hezaran... hezaran! Sed hezaran xort û qîzê me li newalan bêxwedî mane, bêling û bêmil mane û bi sedhezaran gencên me bêserî mane. Dîsa bi sedhezaran qîz û xortên me di qulê kevîran de bêderman mane, kurmî bûne û mirine. Dîsa bi sedhezaran gencê me, bi kîmyasalê hatine kuştin. Vê dewletê çi jê hatiye bi me kiriye! Dîsa jî em aştiyê dixwazin.


Dayikê leşkeran zarokê xwe ji Apo dixwazin, em jî zarokê xwe ji Süleyman Demirel û Ecevit dixwazin. Yê wan bi hezaran çûne, yê me bi bîst hezaran çûne. Em jî doza zarokên xwe dikin.

Öcalan baş e. Ateşkesê (agirbest) dike. Heval didan girtin. Xwedê leşker bi ser hevalan de diçûn, hevala nekarî destê xwe hildin, lê didan ew dikuştin. Dema dewlet aştiyê qebûl neke, wê qiyamet rabe. Dê û bav nikarin zarokê xwe bigirin; çi kurd çi jî tirk. Wê zaf tiştên ecêb û sosret çêbin. Gelî misilmanê bêjin, "Xwezî me ev tiştê hanê nekira!"

Dayikên leşkeran dibêjin, "Emê Apo bikujin, wî parî parî bikin!" Ma wê şehîd û kurê wan rabin? Öcalan tiştê nekiriye. Tirkan kiriye, mezinê wan kiriye. Wan zarokên xwe şandine ser çiyê, zarokê wan çûne li gerîla daye. Gerîla jî dest dibe xwe. Heçî kesê dest nebe xwe, xîreta wî tune ye. Wan gund şewitandinê, wan doza xelkê kiriye? Ew li pey wan geriyane; bi teyarê, tanq û topan... Çi tiştê li darê dinyayê heye kirine. Öcalan ne yê îdamê ye. Wî lihevhatin xwestiye. Öcalan jî roja ewil heya îro xer xwestiye, tiştê nexwestiye.

Bi sedhezaran şehîdên kurdan hene. Niha li dora min sed mal hene, zarokê wan şehîd ketine, lê newêrin bibêjin û bînin ser xwe. Ku em jî serbest bûna, me jî sûretê zarokê xwe hilgirtiba û li mehkemê cihê xwe bigirta... Ka şehîdê kê zaf in û şehîdê kê şepirze bûne? Zarokê wan dimirin, dewlet wan xwedî dike, bi zêr dike. Ka kî me xwedî dike? Kurê min leşkerê dewletê ye, lê ez nikarim kîreya xaniyê xwe bida. Kesekî li me binihêre tune ye. Xebatkarê me tune ne. Zavayê min û kurê wî, çûne Bilîsê, ser mêşê xwe. Ew birine Deştê Rahwayê kuştine û li Tatwanê hilanîne, lê piştî hefteyekî malê wan pê hesiyaye. Tevî vê qasê, dîsa jî em karê tirko dikin. Kurê min niha leşker e. Em 7 kes bi hev re xistin îşkenceyê. Niha bûka min dema em behsa wan tiştan dikin, bêhiş dikeve. Min li 93'yan 16 rojan îşkence xwariye, min ceryan xwariye.

Zarokên me çima çûne serê çiyê? Wan xwendiyê, xwendiyê kesî kar nedaye wan. Heqê wan nedaye wan.



Malbata Mustafa Öz

Dayikên kurd, di vî şerî de, ji her kesî bêhtir zilm û zor dîtin, lê dengê wan ji her kesî kêmîr derket. Lê piştî Doza Öcalan neheqîya ku li wan hate kirin giha ber qirikê. Dayik û malbatê leşkerên tirk, bi her awayî bûn sermijara nûçeyên televîzyonên Tirkiyeyê. Ligel ku zarokên wan gund şewitandin û serî jêkiribûn, cihê herî xweşik ji bo wan hate veqetandin. Li aliyê din, li para dayikên ku gorê zarokên wan ne diyar e; koçber û şerpeze bûne û ya girîngtir mafdar bûn, bi tenê temaşekarî dikeve. Kela dilê wan gelekî rabûye. Me xwest em jî hest û ramanên wan ragihînin.

Beyaz Yakup (19):

Birayê min Yahya Yakup (Samet 1975), li Pasûrê tevî 8 hevalên xwe şehîd ket. Dema şehîd ket, hîna 25 rojên wî tamam nebûbûn. Tevî ku PKK'ê sê caran agirbest ragihand û doza aştiyê kir jî, dewleta tirk doza şer dike. Gelê kurd jî her tim piştgiriya agirbestan ki-

riye, lê gelê tirk piştgiriya şer dike. Dema birayê min şehîd ket jî, dîsa me doza aştiyê kir. Lê aştiya em dixwazin, ne wekî ya ku em dixwazin e. Divê aşti çareseriyê bîne.

Li aliyê din Öcalan lêborîn ji aliyê dixwest. Ev, nîşaneyê mezinahî û rêzdariyê ye. Divê aliyê din jî vê yekê bike.

Qiyet Yakup:

Birayê min Enver (Devran), di sal 1994'an de tevî refên gerîla bû û di sal 1997'an de jî li Pasûrê şehîd ket. Em dixwazin pêşîya vê xwînê bê girtin. Em şer nexwazin. Lê tirk vê yekê fêmanakin. Bi tenê li xwe difikirin. Dibêjin bila her tişt di destê me de be. Ger hinekî bifikirin, divê Apo îdam nekin. Nexwe wê Tirkiyê serobino bibe.

Ahmet Öz:

Mustafa Öz zavayê min li 1992'an hate kuştin. Dema leşkeran avêt ser gund, wan got: "Tu hevalê teroran î!" Lewre wan ew birayê xwe re bir. Me pîrsa wî kir, lê kesî tiştê negot. Piştî sê rojan, şivanan termê wî di nav çem de dît. Pêşî dewletê gote me "Divê hûn bibin koricî", lê me qebûl nekir. Wan jî gundê me şewitand. Me jî mala xwe bir, gundekî din. Piştê jî wan avêt ser vî gundî, hemû gund şewitand.

Apo, serokê 40 mîlyonî ye. Em ne teroran, dewlet me dike teror. Her kes jî bi vê yekê dizane. Ew jî zane, lê heq nake. Em jî leşkeriyê dikin, lê me ji xwe hesab nake. Ku Öcalan jî bikujin jî, ev doz naqede. Lewre ketiye serê me. Êdî zarokê me jî bi vê yekê hesiyane.

Umîd li ba Xwedê ye. Em heta hetayê li pişt Öcalan in. Dema wan Apo kuşt, destê wan ji wan re ye, ê me ji me re ye. Wê tiştên nedîtî çêbin. Bi kuştinê mesele naçe serî. Divê lihevhatinek çêbe.



Beyaz Yakup

Demîrel dixwazin

INSİYATİFA DAYIKAN A AŞTIYÊ:

Me xwest dengê xwe bi dengê li Îmraliyê re bikin yek

Însiyatîfa Dayikan a Aştiyê, roja 6'ê pûşperê li Komeleya Mafên Mirovan a li Stenbolê civînek saz kir û daxuyaniyek da çapemeniyê. Wan daxuyanî, bi taybetî bo dayikên li Îmraliyê, bi giştî bo hemû dinyayê ragihand. Çalakî bi beşdariya nêzî 200 dayikên gerîla û leşkeran pêk hat.

Di daxuyaniyê de dayikan bang li hemû dayikên cihanê, dayikên şehîdan, dayikên leşkeran û rayedaran kir: "Em wekî 'Dayikên Aştiyê' careke din, bi berpirsiyariyêke dîrokî re rû bi rû ne. Ev şerê ku ev 15 sal in didome, ev bar daniye ser milê me. Me di vî şerî de, zarokên xwe, hevalên xwe, mezinên xwe ji dest dan; malên me hatin şewitandin, em ji ser axa xwe hatin vederkirin. Em neçar man ku koçber bibin. Em niha hesreta xweşikahiya gundê xwe, hesreta bêhna axa xwe dikişînin. Şer, em ji van hemû xweşikahiyan dûr xistin. Em li ser navê van xweşikahiyan, li ser navê jiyaneke wekhev dibêjin 'aşti' û aştiyê dixwazin. Em bi berpirsiyariya xwe ya dîrokî careke din bang li dayikên leşkeran dikin: 'Rik, gir, xwîn tu carî nabe çare.'

Dayikên Aştiyê di daxuyaniyê de bang li çapemeniya tirk jî kir: "Em bang li çapemeniya ku ji bo kîn, nefret û doza berberiyê gel sor dike, dikin. Bendan li ber aştiyê daneynin. Li ser jan û êşa mirovan, li berjewendiyên xwe negerin. Û mirovên vî welatî yên demokrat, rewşenbîr, pêşverû; sazî û partiyên vî welatî! Ji bo pêkhatina derfeta aştiyê ya li Îmraliyê pêk bê, karê dikeve ser milê we bi-

kin, vê carê di vê erka dîrokî de nekevin gumanê."

Li ser navê însiyatîfê Müyesser Güneş, der barê armanca pêkanîna vê însiyatîfê, plan û projeyên wan ên pêşerojê, pirsên me bersivandin: "Li aliyekî dayikên li Îmraliyê, ku dikarin hestên xwe bînin zimên, li aliyekî dayikên ku nikarin fikir û hestên xwe bînin zimên, nikarin rahêjin wêneyên zarokên xwe û nîşanî cihanê bidin. Di vê dema ku li Mudanyayê yan jî di çapemeniyê de şer tê gurrkirin de, me xwest em dengê aştiyê bilind bikin. Ji bo ku jan mezintir nebin û kuleke din nekeve ser kulên berê, me xwest em dengê xwe bi dengê li Mudanyayê re bikin yek. Em bang li wan dayikan dikin ku ew, hestên xwe yên rastîn bînin zimên. Ew tene xapandin. Ji bo ku ew jî hestên xwe yên rastîn diyar bikin, em bang li wan jî dikin ku, ew jî beşdarî vê însiyatîfê bibin."

Însiyatîfa Dayikan a bo Aştiyê heta niha bi konsolos, rewşenbîr û nivîskarên re hevdîtin pêk anîne. Di pêşerojê de jî, wê hevdîtin û çalakîyên wan ên bi vî rengî bidomin.

Dîtinên çend dayikên ku beşdarî civînê bûn:

"Heta em kimlika xwe nestînin, wê şer dewam bike"

Fatma Akbingol Bi navê Nazife qîzek û bi navê Samettin Akbingöl û Şemsettin Akbingöl du tiyên Dayika Fatma şehîd ketine

"Em ji Gimgimê (Warto) ne. Gundê me giş hate şewitandin. Malbata me koçî Stenbolê kir. Qîza min Nazife 7 salan di nav şer de ma. Gava ew çû nav gerîla, 17 salî bû. Ew roja 8'ê adara par, 'Roja Jinên Kedkar ên Cihanê' şehîd ket; li Dêrsimê, piştî şerekî 24 saetan dom kir. Em ji vir çûn Wartoyê. Nazife tevî du hevalên xwe di morgê de bû. Min Nazife anî û ew weşart. Nazife qomûtan bû."

Dayika Fatime serpêhatiya tiyên xwe Samettin û Şemsettin ku ji aliyê polîsan ve hatine kuştin jî wiha vedibêje: "Samettin du sal berê tevî nav refên gerîla bû. Ew, berî niha bi du salan şehîd ket. Me nekarî cenazeyê wî bibînin û bînin. Şemsettin jî 5 sal berê li Gimgimê ji aliyê polîsan ve hate kuştin. Ji ber ku zarokên me gerîla bûn, polîsan dida ser Şemsettin."

Dewletê li ser van êş û janan hemûyan, kuleke din jî kiriye ser dilê malbata Akbingölan; kurê tiyê dayika Fatma niha leşkerê tirka ye. Ew bi zorê birine leşkeriyê.


Banga dayika Fatma bo dayikên leşkerên tirk wiha ye: "Ew jî mîna me dayik in. Kezeba wan jî dişewite. Bila bê em destên xwe bidin hev. Em vê xwînê, vî şerî bisekinînin. Bila êşa dayikan mezintir nebe."

Dayika Fatima kîna xwe ya li dijî dewletê wiha tîne ser zimên: "Ku dewlet tişteki bike ji Apo, Apo here, bi hezaran kurd hene. Êdî ew nikare pêşiya kurdan bigire. Wê şer dîsa dewam bike. Wê zarokên me dîsa herin, bibin gerîla. Êdî bila şer bisekine, bila xwîn bisekine."

Gülsüm Bölek:

"Navê qîza min Ezmiran Alkış e. Va ye ev heft sal in, bûye gerîla. Ew niha 23 salî ye. Qet tu xebera me jê tune. Ji ber ku qîza min gerîla ye, dewletê birayê min girt. Dûvre birayê min ê mezin hate girtin, ku ew niha 30 salî ye. Birayê min Yusuf Bölek niha sax e, lê seqet e. Dewletê ew birîndar kir. Gava diya min ev bûyer bihist, jiyana xwe ji dest da. Qorici û leşkeran bavê min jî li malê li bin balkonê kuşt. Piştî vê qasê, divê ku fêlek bikeve dinyayê. Me navê xwîn birije. Em jî dayikên eskeran in, ew jî dayikên eskeran e, em aştiyê dixwazin."

Em xwîna xwe li pêşiya Serokê xwe dirijînin. Em jê re hazir in. Ku dewlet tişteki bike jê jî, şer tu car nasekine. Wê hin mezintir bibe. Heta em daweya xwe,



Îsyatîfa Dayikan a Aştiyê qîriyan da ku dengê xwe yê aştiyê bigihînin dengê aştiyê yê li Îmraliyê.

kimliga (nasnameya) xwe nestînin, wê ev şer dewam bike. Em dibînin, laşên me datînin ser panzêran, li nav kolanan digerin, laşên qîzên me, lawên me perçe-berçe dikin. Em heta hetayê li pey vê dozê ne. Em jê venagerin. Çiqas gundên li dora me hebûn, hemû şewitandin."

"Sedemên vî şerî mezinên dewletê ne"


Helim Demirtaş:

Dayika du şehîdên bi navê Mehmet Tevfik û Abdulvahab e. Dayika Helim jî ya dilê xwe wiha vedike: "Yek jê bavê heşt zarokan bû. Piştî ku bû gerîla bi şeş salan şehîd ket. Evdilwehab hîn nezewicibû. Leşkeriya tirk jî kir. Piştî ku ji wir hat, bi heft salan jî, digot 'Ez naze-wicim'. Çû nav gerîla. Heft salan gerîla ma. Me divê dayikên leşkerên tirk jî vî şerî fêm bikin. Lewre sedema şer mezinên dewletê ne."

Xalise Korkmaz:

"Di 1996'an de zilamê min bû gerîla. Piştî ku çû bi çar mehan şehîd ket. Ew bîst salî bû. Niha qîzeke min heye. Tiye min jî ev heşt sal in gerîla ye. Em nîzain sax e an na! Em aştiyê dixwazin. Eger ku dewlet tişteki bike ji serokê me, ma wê şer xilas bibe? Dê dîsa zarokên me herin. Dudu çûne, emê çar hebên din jî bişînin."

EVIN RONÎ



Nêzî 200 dayikî beşdarî civînê bûn û dilîn û daxwazên xwe ragihandin.

Destnivîsareke Nazîm Hikmet a li ser kurdan

Komarê kurd xapandin

NAZÎM HİKMET

Piraniya mîletê kurd, bi çanda xwe û dîroka xwe ya qedim ku destpêka wê heta bi sedsalan berî niha diçe, li parçeyekî Anatoliyê dijî. Mîletê kurd, tirkên ku li parçeyê din ê Anatoliyê dijîn, ji xwe re wekî bira dihesibîne. Herdu mîlet jî, di nava sînorên Împaratoriya Osmaniyan de, ku wekî hemû împaratoriyan mezin bendixaneya gelan bû, ji hêla mîr û begên kurd û tirk ve li qeyd û bendên zext hatibûn xistin. Piştî hilweşîna Împaratoriya Osmaniyan, her du mîletan jî li dijî împeryalizmê di heman eniyê de, li nik hev şer kiriye. Tevgera Rizgariya Neteweyî, ne tenê bo tirkan, bo kurdan jî rûpela herî birûmet û şerefyar a dîroka wan e.

Straneke herî navdar, ku ji hêla rayedarên tirkan ve hatiye qedexekirin, bi vî awayî dest pêk dike: "Lêxin zariyên kurdan roja namûsê ye." Piştî avabûna Komara Tirkîyeyê, rayedarên tirk û derdorên serdest, di warê naskirina mafên mîletî û mirovî yên kurdan de soz û wadên xwe bi cih neanîn. Heta ewqas pê de çûn ku wan hebûna mîletê kurd a neteweyî jî înkâr kirin. Ev serdem bo rayedarên tirk û çinên serdest, rastî heyama lihevkerîna wan a bi împeryalizmê re tê.

Pêkhatina van her du tiştan, di heman demê de ne bûyereke ketîber e. Rayedarên tirk, ku îro Komara Tirkîyeyê li Rojhilat Nêzîk û Navîn kirine kelaya împeryalizmê, mafên ku bo hindikahiyên din ên di nava sînorên komarê de peji-randine jî nadin mîletê kurd. Mîletê kurd û tirk di nava sînorê Komarê de, di warê politikayên navxweyî û derveyî de, hesreta heman tiştan dikişînin. Ev yek jî rayedarên tirk ditirsîne. Her du mîlet jî dixwazin, nasnava xwe ya neteweyî û çanda xwe digel hev geş bikin û tevî vî yekê jî xwe bigihînin mafên demokratîk û navgînên çandiniyê azad bikin. Gelê tirk û kurd, dixwazin ku Tirkîye di politikayên xwe yên derveyî de bide ser rîya bêlayaniyê û bêriya wê roja ku dê Tirkîye nebe baregeha împeryalizmê dikin. Her wekî çawa welatparêzên rastîn ên tirk di nava sînorên Tirkîyeyê de ji dil û can piştevaniya têkoşîna birayên xwe yên kurd a ji bo bidestxistina



Nazim Hikmet, roja 3'ê pûşperê sala 1963'yan li Moskovayê jiyana xwe ji dest da. Her çend wî qala gelek gelên cîhanê kiribe jî, li ser gelê kurd tişteki berbiçav negotiye. Ev belge-name yekane nivîsa Hikmet a li ser kurdan e.

mafên neteweyî dikin, her wisa jî welatparêzên jidil ên kurd jî bi heman şeweyî piştevaniya têkoşîna gelê tirk a ji bo demokrasî, serxwebûna neteweyî dikin.

Hêzên tarî ên kevneperest û kedxwar dixwazin dijîminatîyê bixin navbera kurd û tirkên ku li Anatoliyê dijîn û destê xwe bixin destê împeryalizmê, hê bi hêsanî gelên me biçewisînin. Ez piştevaniya têkoşîna gelê kurd û tirk a ji bo bextewarî û jiyaneke xweşik dikim. Têkoşîna rizgariya neteweyî ya li dijî hêzên tarî, axayên gund û bajarên, kevneperestan, nijadperestan; kesên ku mafên neteweyî û hebûna gelan înkâr dikin, keysperestên ku ji dijîminatî û dubendiya di navbera gelan de sude werdigirin û nokerên împeryalizmê, bi tenê bi hevalbendiya

kurd û tirkan dikare bi ser bikeve. Bes bi hevalbendiyeke wiha, her du mîletên bira dikarin mafên xwe yên neteweyî û mirovane bi dest bixin.

Têbinî: Ev nivîs, ji hejmara 12'an a sala 1993'yan ya Kovara Newroz Ateşiyê hatiye wergirtin. Belgeya resen di nava arşîva Mîr Kamûran Bedirxan de hatiye dîtîn, ku niha li Înstîtûya Kurdî ya li Parîsê ye. Li pey agahiyên Serokê Înstîtûya Kurdî ya li Parîsê Kendal Nezan, ev belge li ser sala 1961'ê hatiye tomarkirin, lê dîroka nivîsîna wê ne diyar e. Dîsa li gorî agahiyên Nezan, Kamûran Bedirxan li ser Nazim Hikmet ji wî re gotiye, "Me li Stenbolê hevdu nas kir. Di navbera malbatên me de dostaniyeke xurt hebû û heya mirina Nazim jî dom kir."

Em Tev Dîn û Har in

ELÎ XENSO /AMÛDE

Şêx û mele dibêjin, gava mirovek dimire û wî dixin Şewê gora teng û reş, axê diavêjin ser mirî serê xwe radike ku ew jî bide rê, lê serê wî li kêvir dikeve, ji nû ve dimire. Lê Helîm Yûsiv dibêje, "Na! Mirî tu carî ranazên! Çima? Ji ber dema zindî di xew de bin û hinek ji wan gêj bin, mirî tu carî ranazên û tîr bi rewşa me dikenin, kenekî bi girî.

Ez di vî yekê de destê xwe li piştê Helîm dixim û ji wî re dibêjim, "Wê mirî çawa razên? Ku yekî wekî Apê Wehbî (Wehbîko), heval û hogirê Cegerxwîn û Celadet Bedirxan mane bêkes û bêxwedî li sikakên Amûda şewitî, bi roj û pê de digerin. Bêhna genî jê tê; xuya ye ew jî dê bikeve Komara Dînan. Berî niha bi çend rojan Sofî (bavê parsekan), piştî nimêja eşayê bi ser Apê Wehbî de dikir qerebalex. Çima? Tu zû nayê? Ez li benda te gelekî rawestiyam, ezê deriyê mizgeftê bigirim! Wa...! Wekî em tev de zanin, mizgeft malên xwedê ne. Çima sofî bûne dergevan? Wê çawa mirî razên Helîm? Mûyê Mewawîya Bin Ebû Sufyan dirêj û qalînd dibe û naqete. Em tev de Hesên û Husên in. Rojên me tev de Kerbela ne. Li hêla din Abbas Alseffah; şûrê wî hîna jî di destê wî de diheje, zirtên xwe dike û dibêje: "Kî serê xwe rake, ezê serê wî bibirim, bikim dudo!" Berî vî gotinê ji Ebû Muslîm Xorasaniyê kurd re gotiye, "Yê ji xwe re nebe ji me re jî nabe!" Û ew da ber xenceran!



Rewşa me ev e Helîm. Em gihîştine dema Şêx û Meryemkê, ya her dem linghildayî. Şêx di bin çavan re lê dinêhêre û av ji devê wî tê. Dixwaze wê ji xwe re bike cêrî, wekî xwedê û pêxember gotiye û Meryemkê jî dixwaze Şêx ji xwe re bike tolaz. Ezê çi bêjim û çi nebêjim Helîm! Ma ev tiştên li ber çavan dibin qey hindik in? Ji ber vî yekê Helîm, ez di dexlê te de me, ji bona xwedê, ji bo xatirê Xelefo û Mencolê! Tu yê xwe biavêjî bextê Apê Hîndero û jê re bibêjî, "Çend zindî hene dîn û har bûne, dixwazin ji dil bibin leşkes di Komara Dînan de!" Xwe biavêjî dest û lingê wî û ji dil bigirî û bêjî wî, "Apê Hînder! Ev xortên devjihev, diranbeş, lingzirav, telomelo, zikbilind, qûnlihewa ne! Tev de wekî Mîsto ne ji diya xwe tenê ketine, bêpîrik. Xweşiya zarotiya xwe nedîne, ji xeynî tozê û çiroka "Boxê û Gurê Manco". Niha tev de mîna Reşîdê Kal, di nav Guhêrê de rûniştine, arî û pişkulan bi ser xwe de didêrin.


Binêr Helîm! Tu şaş nebî û ji Apê Hînder re nebêjî, "Ewê alîkariya Xelefo bikin, ji sûreke bilind, li dora her çar kuçên Amûdê vegirin, nîşaneyek mezin pê ve kin û li ser binivîsin "Komara Dînen Serbixwe". Na...na.

Şaş nebe ha! Ji wî re bibêje, "Ewê eşkere eşkere, ro li nîvro, agirekî pir mezin berdîn Amûdê, ji bo ter û hişk, şil û ziwa tev de bişewitin. Belkî ew berf û geşa di nava Amûdê de bihele û bibe lehiyeke mezin û xaka me şil û rewşa bibe. Toz vemire, ezman şîn bibe, dîsa gul û nergîz bibişkivin, bilbil li ser daran bi fixan kin, xelk çavên xwe vekin û paqij bikin, ji toz û şeliqê.

Di çapemeniya cîhanê de li ser dozê nirxandinên objektîf

Girtin û darvekirina Öcalan ne çare ye

Pisporê Tirkîyeyê Dr. Celal Muawaz daye zanîn ku di darizandina Öcalan de ihtîmala encaman zêde ye: an cezayê heta hetayê, an jî darvekirin. Muawaz dide zanîn ku hepiskirin û darvekirina Öcalan tişteki çareser nake.



Piştî ku 78 rojan Yugoslavya bi bombeyên NATO'yê hate kutan, şeva 9'ê pûşperê NATO û Yugoslavyayê li baregeheke firokeyan a Fransayê, ku li başûrê Yugoslavyayê dikeve, peymanek girêda. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine, peyman ne bi dilê heyeta Yugoslavyayê bûye, heta berî ku peyman bê girêdan lijneya Yugoslavyayê bi qasî saetekê ji cihê gotûbêjê veqetiyaye, çûye erêkirina Belgradê wergirtiyê, paşê hatiye peyman pejirandiye. Piştî peymanê her du aliyên bi destê hev jî negirtiyê. Her wiha Serokê Amerîkayê Bill Clinton jî bi dudulî xeber daye û gotiye: "Gaveke baş ber bi çareserîya Kêşeya Kosovayê ve hatiye avêtin."

Li gorî peymanê dê hêzên Yugoslavyayê di nava 11 rojan de bi temanî ji Yugoslavyayê vekişin. Piştî vê yekê dê 50 hezar leşkerên NATO'yê ku jî 7 hezar ji wan amerîkî ne, li Yugoslavyayê bi cih bibin. Bicihbûna wan leşkeran dê bi erêkirina Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî pêk were. Ev xal li ser daxwaza Rûsya û Yugoslavyayê ketiye nava peymanê. Hinek endamên

Ji Yugoslavya û NATO'yê peyman nejidil

NATO'yê jî piştigiriya vê yekê dikin û lewre bi wî awayî dagirkirîya NATO'yê di çav cîhanê de

dibe tişteki rêwa. Li gorî peymanê dê hêzên NATO'yê heta dawiyê xwedî raye bin. Her wiha jî bo parastina cihên dîrokî, dê birek leşkerên Yugoslavî jî li Kosovayê bimîne, lê hejmara wan dê negihêje hezari. Di peymanê de navê Artêşa Rizgariya Kosovayê derbas nabe. Lê tê gotin ku dê UÇK çekên xwe yên giran deyne û hêdî hêdî bibe hêzeke polîsan ku jî 3 hezar kesî pêk tê. Her wiha jî UÇK'yê tê xwestin ku dev ji doza serxwebûnê berde û hêzên tundra kontrol bike. Dîsa tê xwestin ku endamên UÇK nekevin pey tolhildanê û êrîşî sirbiyên sivîl nekin.

Mijareke girîng jî vegeandina penaberan e. Rayedarên NATO'yê jî bo vegeandina wan wiha dibêjin: "Di zûtirîn katê de û di mercên herî ewledar de". Lewre mayin û dafikên li ser rîyan, vegeandina penaberan di zûtirîn katê de asteng dikin. Ji bo bicihbûna leşkerên NATO'yê û vegeandina penaberan jî paqijkirina wan mayin û dafikan pêwîst e. Di peymanê de qala bicihkirina leşkerên rûsî jî tê kirin, lê hejmara wan û dema hatina wan ne diyar e.

Piştî 78 rojan peymanek pêk hat. NATO dê çiqas jî derdê gelê Kosovayê re bibe derman ne diyar e. Li aliyê din li Kosovayê bicihbûna hêzên NATO'yê tê wateya parçebûna Yugoslavyayê. Ev peyman Yugoslavyayê hinekî din biçûk dike, jixwe armanca NATO'yê jî ew bû. Her wiha erêkirina Konseya Ewlehiyê ya NY'yê çiqas dikare dagirkirina Kosovayê rewşa nişan bide, ew jî hêjayî nirxandinê ye.

SAMÎ BERBEYAN

★ BEŞA NÛÇEYÊN DERVE

Vê hefteyê jî Doza Sedsalê di çapemeniya cîhanê de bi berfirehî cih girt. Nirxandin û nûçeyên li ser dozê, ji hefteya din erênî-tir in. Tê ditin ku cîhan jî hêdî hêdî wateya gotinên Öcalan bastir fêm dike. Lê hê jî weşan û ajansên ku nirxandinên klasîk dikin gelek in. Em jî nav nûçe û nirxandinên li ser Doza Sedsalê çend hebên balkêş pêşkêş dikin.

Reuters

Partiya Çepgir a Îtalyayê Tirkîye hişyar kir

Li gorî nûçeyê ku Ajansa Reutersê roja 9'ê mehê ragihandê bîkîrên (abone) xwe, Partiya Çep a Demokratî a Serokwezîrê Îtalyayê Masimo D'Alema, da zanîn ku heke Tirkîye cezayê darvekirinê bide Öcalan dê têkiliyên Tirkîye û Îtalyayê gelekî aloz bibin. Li pey agahiyên ajansa navborî, Serokê vê partiyê Walter Veltroni di civîneke jî bo hîlbijartinên Parlemonto-ya Ewrûpayê de gotiye, "Çepgirên Ewrûpayê divê li dijî çewsandina mirovan be; çî Kosovayî çî jî kurd". Di nûçeyê de hatiye diyarkirin ku kurd dibêjin gelek mirov jî hêla hêzên dewletê ve hatine kuştin, gelek kes jî ber zilma dewletê reviyane. Di nûçeyê de ditina hikûmeta Îtalî ya bi rengê, "Heke Tirkîye Öcalan bi darve bike, divê endamtiya Yekîtiya Ewrûpayê jî serê xwe bavêje." jî cih girtiye.

Frankfurter Rundschau

Dê fermana Öcalan rakin

Nûçeyêke şîrovevî ya berfireh di hejmara roja 8'ê pûşperê ya rojnameya almanî Frankfurter Rundschau de hatiye weşandin. Nivîs ji hêla Gerd

Hohler ve hatiye nivîsandin. Di nivîsê de li ser bêdadiya dadgehê, helwesta dewleta tirk a neyînî û mercên ku Öcalan tê de ye, bi berfirehî hatiye rawestandin. Bo nimûne, li gorî nivîskare rojnameya navborî, digel gotinên Serokwezîrê tirk ên ku vê dadgehê wekî "rûspaniya Tirkîyeyê" nişan dide, di darizandinê de gelek aliyên nehişîyî balê dikişînin. Di nivîsê de li ser rewşa tendurîstî ya Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî gelek şik û guman hatine zimên. Her wiha gelek kema-siyên li dadgehê û tundbûna bergiriyên ewlehi jî hatine rexnekirin.

El Arabî

Hepiskirin û kuştina Öcalan derdê Enqereyê derman nake

Di bin vî sernavî de rojnameya El Arabî di hejmara xwe ya roja 8'ê pûşperê de cih daye ditinên pisporê Tirkîyeyê Dr. Celal Muawaz. Pisporê navborî daye zanîn ku di darizandina Öcalan de ihtîmala encaman zêde ye; an cezayê heta hetayê, an jî darvekirin. Muawaz dide zanîn ku hepiskirin û darvekirina Öcalan tişteki çareser nake. Ew bi bîr dixê ku Kêşeya Kurd xwediyê bingeheke siyasî, civakî û aborî ye. Dr. Muawaz diyar dike ku di şer de dewleta tirk jî gelek karên nelirê kirine û ev tişt Tirkîyeyê jî dixê rewşa bersûcan. Pisporê navborî, guherînan di DGM'yan de wekî bergiriyên demdemî dibîne û balê dikişîne ser vê rastiyê ku Öcalan ji sala 1991'ê vir de pêşniyaza aştiyê li Tirkîyeyê dike, lê Tirkîye bersiveke erênî nedaye wî. Her wiha ew diyar dike ku Öcalan dîsa banga çareserîya aştiyane kiriye, lê

dîsa bersiva wî nehatiye dayin.

El Ahrar

Öcalan dadgeha tirk vegeandê warê hev-ditina siyasî

Di hejmara roja 6'ê pûşperê ya rojnameya Misirê El Ahrarê de nirxandinêke balkêş li ser Doza Sedsalê hatiye weşandin. Di destpêka vê nirxandinê de gotinên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ên bi şeweyê, "Ji bo min 5 hezar kurd amadevî xwefedakirinê ye" cih girtiye. Di dîmahêka vê nivîsê de hatiye diyarkirin ku Tirkîyeyê xwestiyê dozê di çarçoweya dozeke adli de bihêle, lê Öcalan rengekî siyasî daye dozê. Di nivîsa navborî de hatiye diyarkirin çapemeniya tirk jî ber vê yekê xwestiyê Öcalan wekî tirsonek nişan bidin. Di nivîsa El Ahrar de mebesta Öcalan bi awayekî zelal li ber çavan hatiye raxistin. Li gorî amadekarê vê nivîsê çapemeniya tirk bi zanatî û çapemeniya Ewrûpayê jî bi nezanî gotinên Öcalan berevajî kirine. Di nava nivîsa El Ahrar de daxuyaniya Konseya Serokatîyê ya PKK'ê ku tê de piştevanîya xwe ji bo banga Öcalan diyar dike jî cih girtiye. Di dawiya nivîsê de wiha hatiye gotin: "Çalakiyên PKK'ê yên ku rojane pêk hatiye, nişanî Tirkîyeyê daye ku darvekirina Öcalan ne çare ye û bi vî awayî jî hêz daye wî. Divê mirov zêdebûna pesta hêzên derveyî yên li ser Tirkîyeyê jî jî bîr neke. Tiştê jî bo Tirkîyeyê herî baş ew e ku di vê roja ku ew gelekî bihêz e de li çareserîya kêşeyê bifikire, heke wisa neke dê firsendeke gelekî baş jî dest xwe bide der. Vî şerî Tirkîye lawaz kiriye, dê lawaztir jî bike."

Em dixwazin Serokê me berdîn

MERHEBA!

Hevalên we roja 1'ê pûşperê ji bo piştgiyaya Serokê xwe Abdullah Öcalan, beşdarî meşên li Almanya û Belçîkayê bûn. Ji bo şermezarkirina dewleta Tirkîyeyê û hevkarên wê; ji bo dengê xwe bigihînin hemû zarok û mezinên dinyayê, da ku ew jî dengê wan bibihîzin, rastiyê fêm bikin. Hevalên we di vê meşê de rahiştibûn posterên Serokê xwe û diqîriyan bi slogana "Bo Öcalan azadî, bo Kurdistanê aşî".




Wan jî dixwest wekî hemû zarokên cîhanê di nav aşî û azadiyê de bişînin. Bi zimanê xwe bixwînin, binivîsin, perwerde bibin. Li ser axa xwe bişînin. Wan dengê xwe yê piştgiyayê jî bilind dikir ku dengê wan ji wir bigihêje Îmraliyê, bigihêje Serokê wan. Wan gava rahiştibûn posterê Serokê xwe û her du tilikên xwe rakiribûn, hêvî û daxwaza serkeftinê nîşanî hemû zarokên cîhanê didan. Da ku bişînin wekî hemû hevalên xwe...

'EZ DIXWAZIM BIBIM SEROK'

Serokê me girtî ye û wî dibin nav tirkan. Û çavên wî girêdan. Wî çaxî em çiqas qeherîn. Çunkî Serok kiribûn camên ku derbê tivingê tê re derbas nabin. Tirk ji Serok diqeherin. Dixwazin Serok bikujin. Em dixwazin herin dibistana xwe, em diherin dibistana tirk û em dixwazin em bi zimanê xwe bixwînin.

Ez wexta mezin bivim, ezê bivim gerîla. Ez dixwazim bibim Serok.

Navê min: Mehmet Emin Kurd. **Salê min:** 10



"EM DIXWAZIN SEROKÊ ME BERDÎN"

Em dixwazin Serokê me Apo berdîn. Em pir ji Serokê xwe hez dikin. Ema Roma Reş Serokê me zevt kir. Roma Reş çavên Serokê me bi paçekî pîs girêdan û ew kir hepsê. Ji bo vî hawî em pir nefretê ji roma reş digirin, em û giştik gerîla dixwazin Serokê me Apo ji destê Roma Reş xilas bibe.

Wexta dijminan Serokê me girt, canê min pir şewitî. Hew ne canê min, canê giştik gerîla şewitî.

Navê min: Lokman Şervan
Salê min: 11



'EZÊ HEQÊ SEROK BISTÎNIM'

Serok Apo girtin. Çavên wî girtin. Bi kîsê reş girêdan serê wî girtin, ser çavê wî giştik spî bû. Ku ez mezin bibim, ezê bibim

eskerê kurmancan; ezê heqê Serok bistînim.

Tirkan bikuje, ji destê wan derkeve, zûka derkeve Serokê me.

Navê min: Mehmet Şêrîn Azad. **Salê min:** 9




Tîrêjên Baweriyê derket

Tîrêjên Baweriyê, bi hejmara xwe ya pûşberê, derket pêşberî xwendevanan. Ji ber ku hejmara duyem a meha gulanê ji aliyê Dadgeha Ewlehiya Dewletê (DGM) ve hatibû desteserkirin, negihîştibû ber destê xwendevanan.

Di vê hejmarê de, bi nivîsa di bin sernavê "Pevçûna Mu'mîn û Muşrikan" (Mü'min Ve Müşriklerin Çatışması) de rewşa siyasî hatiye nîrxandin. Di nivîsê de rewşa cihanê, bandora împeryalizm û sîyonîzmê ya li ser cihanê, her wiha rewşa Ewropayê û di van şertan de cihê kurdan hatiye analîzkirin, Nivîs balê dîkşîne ser stratejiyên NATO'vê û diyar dîke, ji ber ku PKK û Serokatiya wê antî-împeryalist û antî-siyonist e niha bûye hedefa NATO'yê.

Di vê hejmarê de nivîseke din, ku balê dîkşîne ser xwe jî, rêzenivîsa bi sernavê "Musul Meselesi (Kêşeya Mûsilê)" ye. Bi awayekî lêkolînî li ser Kêşeya Mûsilê, tekilî û peymanên navneteweyî yên wê demê, taybetiyên salên 1925'an, komkujiyê li ser kurdan pêk hatine û serhildanên kurdan hatiye rawestandî. Mirov di nivîsê de digihêje vê encamê ku Tirkiyeyê Mûsil ji berdêla komkujîya kurdan daye îngilîzan. Tê xuyakirin ku dema Mûsil nehata dayin, dewletên ewrûpî kengî kurdan serî hilda, wê ji bo berjewendiyên xwe li piştta kurdan rabûna. Di nivîsê de li ser komkujiyên dewleta tirk û serhildanên kurdan hin a-



gahî tene dayin.

Ji bilî van nivîsan, nivîsên di hejmarê ev in: "Jin Kela Jiyanê ye, Bê Kele Jiyan Ava Nabe", "Dersên Şerîetê", "Mucahîdê Çavresê Tolhildanê", "Qurban (Gorî)", "Mafên Hindikahiyan ên Ne Musluman", "İslam Ümmetçilği Yahut Enternasyonalizm (Umetperweriya İslamî yan jî İnternasyonalizm)".

SERWISA ÇANDÊ

Awaza ji "Cîhaneke Jibîrkirî"

Kasete Nazê û Newroz, ku tevî Koma Oriental Mood xebatên xwe li Ewropayê didomînin, ji aliyê Kom Muzîkê ve hatiye derxistin. Li gorî agahiyên ku di pêşka kasetê de cih girtiye Nazê ji kurdên Gurcistanê ye û ji 11 saliya xwe vir de bi karê muzîkê radibe. Her wiha hevalê wê Newroz jî ji Silêmaniyê û ew jî di karê muzîkê şareza ye. Koma Oriental Mood jî ji kesên biyanî pêk hatiye. Di nava komê de 4 danîmarkî, yekî îtalî û yekî tirk cih digirin.

Hemû stranên di kasete Newroz û Nazê de gelêrî û li ser evîna dilan û jiyana civakî ya gelê kurd in. Di kasetê de stranên ji her çar parçeyên Kurdistanê û bi sê zaravayên kurdi, kurmancî, soranî û dimilî hene. Dengê stranbêj Nazê dengê kurdewarî ye û dengê wê gelekî li stranên gelêrî tê. Newroz jî, ku bi xwe kurdê soran e, stranên soranî distire û dengê li ser wî dengê kurdewarî ye.

Lê di kasetê de amûrên gelêrî zêde dernakevin pêş, amûrên mîna klarnet, elektro gîtar regekî din daqe muzîkê. Ango vê rese-




niya ku awaza stranbêjan daye stranan, di amûran de nin e.

Di kasetê de digel herêma ku stran jê hatiye berhevkerin û kesê berhevkar, meqamê stranan jî hatiye nivîsandin. Her wiha di nava kasetê de danasîna hunermend û stranan bi kurdî û îngilîzî hatiye kirin. Ev jî helwesteke neteweyî û di cih de ye. Wekî encam mirov dikare bibêje ku berhema Nazê û Newroz di warê muzîka gelêrî ya kurdî de xebateke heja ye.

Pautus

OSMAN ÖZÇELİK



Nivîskar Ahmet Altan, di kovara Aktuelê de, bi sernavê "Pautus" nivîsek balkêş nivîsandibû. Ew di dawîya nivîsa xwe de behsa çîroka Pautus dike û wiha neqil dike:

"Pautus serleşkerê Împaratoriya Romayê bû. Li hemberî Romayê serhildanek li dar xist. Hate girtin. Bi îdamê hate cezakirin. Ji ber Pautus eslîzade bû, li gorî kevneşopiyên Romayê maf danê ku ew jiyana xwe biqêdine û xwe bikuje. Xistin hundirê odeyê vala û xencerek danîn ser maseya odeyê.

Bavê wî, jina wî, dost û merivên wî li derve, di nava kedereke kûr de, dipan ku dengê ketina laşê wî were. Lê li şûna vê, Pautusê ku xencêr li xwe xistiye, dengê meşa lingên Pautusê, ku nikare xwe bikuje tê.

Şermeke bêdeng giştikan radipêçe. Piştî jina wî ya ku nema ji ber şermê debar dike, bêyî ku ji tu kesî re bêje, derî vekir û bêdeng kete hundir. Rahîşt xencêra li ser maseyê û li zîkê xwe xist. Paşê xencêra bi xwîn, ji zîkê xwe kişand û da mêrê xwe. Û got:

"Binêre Pautus, qet naêşe"

A. Altan dibêje "Yên ku jiyan kirine qada îmtihana mîrxasiyê, yên ku ferman dane kesên din ku deriyê xwe ji mirinê re vekin, pêwîst e ku gava mirinê li deriyê wan xist, ew jî bi kêmanî, bi qasî kesên ku ji ruyê wan mirine, mîrxas bin".

A. Altan ji dîrokê mînakên mîrxasiya serkêşan dide. Fatîh Rüştü Zorlu, Celal Bayar, Deniz Gezmiş... Hüseyin Cahit ji dadmendên Dadgeha Serxwebûnê (İstiklal Mahkemesi) ku rojê çendek kes li ber deriyê wî bi darve dibûn re gotiye, "Çêtir e ku ez di vê dadgehê de, ne mîna te dadmend im û ez wekî bersûc tême darizandin".

Ji serkêşên "İttihat Terakî" Yakup Cemil, piştî nakokî di nava wî û Enver Paşa de derdikeve, wî dişînin îdamê. Di rê de, ji leşkerên dê wî bikujin re zebîşekî dikire û diyarî wan dike.

Serkêşê şoreşa Fransayê Danton ji giyotînkirinê natirse û ji celadan re dibêje, "Serê min ê jêkirî nişanî gel bidin".

Che Guevara, gava ku li serê çiyê hate kuştin, qet ji qesasan lêborîn nexwestiye û lavelav nekiriye.

Li Şiliyê serok-komarê marxîst Allende, demançe di dest de hatiye kuştin, teslîm nebûye.

Di dîrokê de gelek lîder hatine kuştin. Pirtirên lîderan nehiştiye ku kesên ji bo wan xwe dane mirinê, ji ber wan şerm bikin. Dostên wan ji bo wan qeherîn, belê şerm nekirin. Bi eşkereyî nabêjin jî dijminên wan ji wan re rêz girtin.

Di sohbetekê de şewirmendên qralekî yew-

nanî jê dipirsin: "Gelo mîrxasî girîng e, yan aqil?" Qral dibêje: "Ger herkes bîaqil bûya, pêwîstiya me ji mîrxasan nedima." Ango her kes ne bîaqil e, ji ber vê yekê ye ku di dîrokê de mîrxas zehf in.

Ahmet Altan ji kêmanî kesane ku êqil di ser mîrxasiyê re digire. Dîsa ew jî mîrxasiyê dixwaze. Bêaqiliyê ji kurdan re tenê mîrxasî hiştiye. Ji kurdan bêhtir, tu gelî mîrxas nedane dîrokê. Di ser de mîrxasên kurdan ne "Mîrxasên Zebeşan" bûn. Gava Seyid Riza hate darvekirin, gotibû, "Li ser çiyayên Kurdistanê, di bin her deviyekê de "Rizo"yek heye. "Bi rastî bi dehhezaran "Rizo"yan mîna herin govendekê, jiyana xwe dan. Şêx Seidê kal, Xalî Begê Cibrî, İhsan Nûrî Paşa gernasên dîrokî ne. Bi sedan ji bo jiyaneke birûmet agir berdan bedena xwe, bi bombeyan laşê xwe mîna zîpikê belav kirin. Ji me re mirovên bîaqil lazim in. Pêwîstiya me ev e. Paşê kê gotiye tirsê jiyana rapêçaye.

Kijan newêrek, tirsok, dikare xwedîtîyê li kuştina bi dehezaran kesên ku ne wî kuştîye, bike. Kijan kurê bavan dikare ji kuştîyên li dijî xwe re bêje "şehîd" û lêborîn bixwaze. Yê gihîştîbin kûraniya aştiya mirovahiyê, dibînin ku li hember dinyayê ne bizdonekî, mîrxasiyêke kûr heye.

Û mîrxasiyê ve carê xwe gihandiye êqil. Aqil û mîrxasî bi hevdu re dimeşe.

Farzetkî ez ağac im

Li kuçeke Amedê otobûsek bi rê de dice, mirovek ji li ser rê ye û rê nade otobûsê. Şofêr li qor-nayê dixê, dike nake fêde nade. Serê xwe di şibakê re derdixê û dibêje: "Xalo rê bide ez derbas bim."

Xalo şewqaya xwe berdaye ser çavên xwe, patoyê xwe avêtiye ser milên xwe, poça solê xwe şikênandiye û ji şofêr re dibêje: "Ma farzetkî ez ağac im, sende soldan geç?"

Kevir û mirov

Mirovekî pêxas ji mala xwe derdikeve, li kuçeyê lingê wî li kevirê dikeve, lê ew di bin vê yekê de dimîne? Ji ber xwe demançeya xwe dikişîne û heft heb gule berdaide kevîr û ji kevîr re dibêje: "Tu yî dikevi ber lingê min ha!"

Qedayîf û pîvaz

Mirovekî zaza dice pastaxaneyê, bangî garson dîke, dibêje: "Ji min re qedayîfê bîne."

Garson qedayîfê tîne, dide ber, zilamê zaza dibêje: "Ka pîvazên vê qedayîfê?"



BERHEVKAR: FIRAT AŞTÎ

Peyvên tirkî sê heb in

Rojekê yekî kurd û yekî türk li ser

zimanê kurdî û tirkî mînaqêşe dikin. Yê tirk wekî bab û kalên xwe înkara ziman û çanda kurdî dike û dibêje:

- Çand û zimanê we tune ye. Zimanê we tev tirkî ye. Tenê çend peyv kurdî ne û ew ji nabe ziman.

Îcarê yê kurd hêrs dibe û dibêje:

- Yaw di ser zimanê xwe re tu behsa zimanê me dikî. Ê weleh got kurd, ereb, faris û inglîz peyvên xwe ji nava zimanê we derxin. Tenê sê peyvên we dimînin. Ew ji ev in: "Lan, oxlîm û kahtolsun PKK" ne. Basqe tu tişt nîn e.

BERHEVKAR: QAHIR BATEVÎ

Alan çixsîn

Li bajarê Wanê berî 12'yê rezberê Lmilet ketibû rêza neftstandinê. Rêza mirovan dirêj bûbû. Mirovên di rêzê de bûn bi piranî ji eşîreta Alan bûn. Leşker tên dibêjin: "Alan çixsîn, alan çixsîn." Zilamên ji eşîreta Alan dibêjin qey ji wan re dibêjin, ji rêzê derdikevin û bi dar û kevîran êrişî leşkeran dikin, dibêjin: "Kurê kerê ma me çi we kirîye hûn dibêjin, 'alan çixsîn'?"

Muzîka klasîk û sêwazî

Bi avakirina Komara tirk re ji bo pêşketina civakê Koma Orkestraya Muzîka Klasîk derdikeve tûrneya Anatoliyê û bajar bi bajar digere û konseran dide. Tê Sêwazê konserê dide û li dûv konserê ji yekî dipirsin ka konser çawa çû.

Zilam bersivê dide, dibêje: "Sivas Sivas otalî böyle zulüm görmedi (Sêwazê tu car zilmeke wiha nedîtibû)"

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (176) XAÇEPIRSA

İngilizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Farsça	پ	ق	ر	س	ت	و	خ	ی	ز		
Fransızca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İspanyolca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Portekizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Rusça	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Arabic	پ	ق	ر	س	ت	و	خ	ی	ز		
Yeni Türkçe	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İtalyanca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Almanca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunanca	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Çince	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yaponca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Korece	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Japonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Armenî	Ք	Գ	Ր	Տ	Մ	Վ	Ջ	Ի	Ն		
Georgiya	ქ	გ	რ	ს	მ	ვ	ჯ	ი	ნ		
Osmanlıca	پ	ق	ر	س	ت	و	خ	ی	ز		
Belarusça	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Ukrayna	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Polonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunani	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Portekizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İspanyolca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Fransızca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İngilizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Almanca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunanca	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Çince	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yaponca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Korece	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Japonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Armenî	Ք	Գ	Ր	Տ	Մ	Վ	Ջ	Ի	Ն		
Georgiya	ქ	გ	რ	ს	მ	ვ	ჯ	ი	ნ		
Osmanlıca	پ	ق	ر	س	ت	و	خ	ی	ز		
Belarusça	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Ukrayna	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Polonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunani	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Portekizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İspanyolca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Fransızca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İngilizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Almanca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunanca	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Çince	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yaponca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Korece	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Japonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Armenî	Ք	Գ	Ր	Տ	Մ	Վ	Ջ	Ի	Ն		
Georgiya	ქ	გ	რ	ს	მ	ვ	ჯ	ი	ნ		
Osmanlıca	پ	ق	ر	س	ت	و	خ	ی	ز		
Belarusça	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Ukrayna	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Polonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunani	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Portekizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İspanyolca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Fransızca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İngilizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Almanca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunanca	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Çince	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yaponca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Korece	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Japonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Armenî	Ք	Գ	Ր	Տ	Մ	Վ	Ջ	Ի	Ն		
Georgiya	ქ	გ	რ	ს	მ	ვ	ჯ	ი	ნ		
Osmanlıca	پ	ق	ر	س	ت	و	خ	ی	ز		
Belarusça	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Ukrayna	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Polonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunani	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Portekizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İspanyolca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Fransızca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İngilizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Almanca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunanca	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Çince	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yaponca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Korece	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Japonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Armenî	Ք	Գ	Ր	Տ	Մ	Վ	Ջ	Ի	Ն		
Georgiya	ქ	გ	რ	ს	მ	ვ	ჯ	ი	ნ		
Osmanlıca	پ	ق	ر	س	ت	و	خ	ی	ز		
Belarusça	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Ukrayna	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Polonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunani	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Portekizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İspanyolca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Fransızca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İngilizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Almanca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunanca	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Çince	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yaponca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Korece	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Japonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Armenî	Ք	Գ	Ր	Տ	Մ	Վ	Ջ	Ի	Ն		
Georgiya	ქ	გ	რ	ს	მ	ვ	ჯ	ი	ნ		
Osmanlıca	پ	ق	ر	س	ت	و	خ	ی	ز		
Belarusça	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Ukrayna	П	Q	Р	С	Т	У	В	Х	Y	З	
Polonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunani	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Portekizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İspanyolca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Fransızca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
İngilizce	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Almanca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yunanca	Π	Q	Ρ	Σ	Τ	Υ	Φ	Χ	Ψ	Ω	
Çince	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Yaponca	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Korece	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Japonya	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Armenî	Ք	Գ									

MEM KAYA

BÊJING



Goreyê vatena abûkatê Öcalan Ahmet Avşarî qeraro ke serniye dewlet de diyayo cezayê îdamî yo. Öcalan bi xo jî rind zano dewleta cezayê îdamî bido ci, feqet Öcalan vano ke, cezayê îdamî ey dayina teva (çikê) nêkewno dewlet dest. Eke dewlet cezayê îdamî înfaz bikiro, dinya ra tecrît bena û tikûtenya manena.

ÎMRALÎ RA XEBER ESTA

Qerar diya formalîtey mendî

MEMED DREWŞ

(e.mail:mehmet@welat.com)

Hetanî 23'yê meng (aşm) a pûşpera 1999, qandê abûkatî û Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan parastina xo hedire bikiro, maben diya Doza Sesere. Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan û abûkatê ci yê hetanî 23'yê meng parastina xo hedire bikirê û parastina peyin û esasî bidê mehkema.

Dozgerê tirk rojê 8'e menga pûşpera 1999 de wasten û vînayinê dewlet ardî zivan û peynî de der heqê Öcalanî de cezayê îdam wast. Dozgerê tirk parastina Öcalanî ya verîn, zey taktîk hesabna û vat: "Öcalano her çiqas vano: 'Mayê nêwazem dewlet birjînim (raşanim), armanca maya ronayinê dewleta ciya çin-yo, verî armanca ronayina dewlet estîbi, feqet ewro wastena ma ya winayin çin-ya, mayê wazem çorşmeyê sînoranê ewroyinan de şertanê birayin û demokrasî miyan de piya bimanim' jî Öcalano rast nêvano û nê qisan qandê ganê xo xelisnayin vano. Coka lazim o ke goreyê madyê 125'ê qanûnê cezayê tirk cezayê îdamî bidiyo Öcalanî."

Ze ke yeno zanayin Öcalanî hefte yo verîn, parastinê xo çorşmeyê "Jûwîna Demokratîk" de viraşt û qandê çareserkerdina meseleya kurd û demokratbiyînê dewlet jî, jû raya nerm mûsnê dewleta tirk. Raya ke Öcalanî musnê dewlet; hend nermî ke, xeylê kesî şaş mendî û xeylê kesan vaten û parastinê Öcalanî qandê dewleta tirk zey firsendo gird hesabna û wast ke dewlet qîmet bido vaten û parastinê Öcalanî.

Feqet vatenan û wastenanê dozgerî ra oyo winî ayseno (vînyeno) ke dewleta

nêwazena gam çekiro û aya raya verîn de israr kena. Guniya ke hetanî nika rijyaya, tayn vîna û wazena hendna gunî birijyo û hendna may (dayikî) bîbermê û hendna cenî viya, qeçekî (domanî) jî seykur bimanê. Coka rojê mehkeme ra na kiştö, aya toximê şovenîzm kena vêsî (zaf). Serdar û Wezîrê dewletê vernî ra hiqûqî ihlal kenê û eşkerakerdînanê xo de vanê ke, lazimo cezayê îdamî bidiyo Öcalanî û înfazê ci jî hema biviraziyo. Nînan ra jew nîmûne. Serokê Giştî yê MHP û cagenoyê Serokwezîrê Tirk Devlet Bahçeli persa rojnameyê Starî (manşeta rojê 9 menga pûşpera 1999) ser vato ke lazim o cezayê îdamî bidiyo Öcalanî, eke cezayê îdamî bidiyo, iyê qandê înfazî raya xo bidê.

Toximê şovenîzmo kariyeno

Bewnê Devlet Bahçeli cagenoyê Bülent Ecevitî yo. Yanê cagenoyê serokwezîrê tirk o. Goreyê qanûnanê înan, hetanî mehkema meqediyö, lazim o kes derheqê a mehkema de qisey mekîro, eke bikîro sûc o. Çi ke wexto jew serdar yan jî wezîrê dewlet der heqê mehkemeya de qisey bikîro yan jî kerd, heyeta a mehkema tesîrê ê serdar, yan jî wezîrê dewlet de manena û qerarê a mehkema jî adilane nêbeno. Qandê qerarê adilane lazim o ke serdar û wezîrê dewlet derheqê mehkema de qisey mekirê. Rojnameyê û televîzyonî jî weşananê xoya heyeta mehkema tesîrê xo bin de meternê. Tabî nê vatenan ser mevajê, şimayê dewlet û medya ya tirk ra mehkemaya adilane pawenê. Bêguman mayê dewleta tirk ra tevayö winayin nêpawemi, feqet mayê wazem qanûnanê ci biyame ci vîrî.

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan û abûkatê ci yê hetanî 23'yê menga pûşpera 1999 parastinê xo yê esasî hedire bikirê û bidê mehkema. Goreyê vatena abûkatanê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî ra Ahmet Avşarî, iyê winî taxmîn kenê ke, Doza Sesere 25'ê meng de biqediyö. Abûkatê Öcalanî Ahmet Avşarî vat ke, qerarê Doza Sesere serniyê dewlet de diyayo, jew formalîtey mendê. Dewleta nika wazena formalîtan biyaro ca. Sebebê taloqkerdînanê jî cardinê formalîtan o.

"Eke înfaz virazyo dewlet dinya ra tecrît bena"

Goreyê vatena abûkatê Öcalan Avşarî qeraro ke serniye dewlet de diyayo cezayê îdamî yo. Öcalano xo jî rind zano dewleta cezayê îdamî bido ci. Feqet Öcalano vano ke, cezayê îdamî ey dayina teva nêkewno dewlet dest. Eke dewlet cezayê îdamî înfaz bikîro, dinya ra tecrît bena û tikûtenya manena. Dişmenîna ke mabenê şarê kurd û tirk de abiyo jî hezar ser, ravêro jî werte ra nêhewadiyena. Eke dewleta wazena dewleta gird bo, lazim o ke goşê xo bido vengê kurdan. Sebê vernî ra hetanî nika sernî de menayin tirkan destegê kurdan o.

Abûkat Ahmet Avşarî da zanayin ke eke zey pawitina înan peyniya mehkema de cezayê îdamî bidiyo, haqê înan esto ke, ê qerarê DGM'ya Enqere berê mehkemeya berz (yargıtay). Eke mehkemeya berz qerarê DGM tasdîq bikîro, na fin jî iyê berê Mehkemaya Haqê Merdimanê Ewropa. Feqet goreyê qanûnanê tirk mehkemeya berz ke qerar tasdîq kerd, ê qerarî rêşena parlamento eke parlamento jî tasdîq kerd înfazê ê qerarî

virazyeno. Tabî qerar ke DGM ra û peyra jî mehkemaya berz ra vejîya abûkatê Doza Sesere berê Mehkemaya Ewropa. Ze ke yeno zanayin Mehkemaya Ewropa ya DGM'an mehkemaya xoser nêhesibnena. Coka eke abûkatê Öcalanî doza sesere berê Mehkemaya Ewropa dewleta Tirka wîja vînî bikîro.

Rolê mehkemeya Ewropa

Ancî tiya jû pers esta. Wexto ke mehkemeya berza Tirkiye qerarê îdamî tasdîq bikîro û birêşo parlamento, înfazo biviraziyo? Goreyê vatenan eke mehkemaya berz qerarî tasdîq bikîro, parlementerê tirk tasdîq kenê û hema hema pêro raya xo danê, qandê înfazkerdina qerarî. Persa muhîm jî aya tiya. Rolê mehkemaya Ewropa tiya çiqayî? Mehkemaya Ewropa şena înfazî vindarno. Goreyê vatena serdarê Baroyê Stenbolî abûkat Osman Erginî ihtimalê vindarnayin esto. O ihtimal jî wîna yo: "Wexto mehkemeya berz qerar tasdîq kerd û abûkatê Öcalanî doz berê mehkemaya Ewropa û îdia bikirê ke qerar adilane niyo, Mehkemaya Ewropa ewnena ê qerarî. Feqet qandê cezayê îdamî nê, qandê nêadilaneyê mehkema û ewnena. Tabî ihtimalê herey mendin jî esto. Feqet abûkatî ke cezayê îdamî sebeb bimûsnê û biwazê ke mehkema a doz rew bigiro rojewê xo, ezo bawer (emel) kena mehkema a doz hema gena rojevê xo û qerarê dana."

Goreyê vatena serdarê baroyê Stenbol abûkat Osman Erginî qerarê Mehkemaya Ewropa Tirkiye girêdenê dewleta tirk mecbûra goreyê qeraranê mehkemaya Ewropa hereket bikîro. Çike Tirkiye şertê Mehkemaya Ewropa îmza kerdê.

Hunermend Ahmet Kaya:

Ez dixwazim li Tirkkiyeke demokratîk bijîm

Birêz Kaya, di merasîma xelatdayîna ku ji hêla 'Magazîn Gazeteciler Derneği (Komeleya Rojnamgerên Magazîn)' ve hatibû lidarxistin de, gotinên we yên wekî "divê pirsgirêka kurd çareser bibe, ezê klîba kurdî çêbikim" bûn sedema reaksiyonên tûj. Li wê derê we dixwest hûn mesajeke çawa bidin?

✓ Êrîşên wisa normal in. Li Tirkiyeyê mirov nasnameya xwe rave bike, bibêje "ez kurd im" di wê gotinê de xelîyek derdekive holê. Yekser tu wekî 'terorîst' têtî binavkirin. Ev ne rast e. Mirov çî be, divê bibêje. Ji hêla şexsî ve bi gelê tirk re problemeke me tune ye. Pêwîst e ku her mirov nasnameya xwe di bêrîka xwe de bigerîne. Mirovekî kurd kurd e. Li cem me gotinek heye, dibêjin, "Kesê xwe înkâr bike, heramzade ye" Hûn diazînin roja ku ew qewmîn pêk hat, ez bi çî hesiyam? Ez têtîhîştîm ku tirk ji kurdan hez nakin. Ka em tirk û kurd bira bûn? Yaho ev çawa biratî ye ku ew tas, firaq-miraq nehiştin, hema mabû ku ez lînc bikirama! Heke yek rabûya bigota 'ez tirk im' gelo wê ev tişt bianîna serê wî. Yekî rabûya bigota 'ez rûm im, inglîzîm', wê wisa bikirana? Na kesî nedikir. Gelek şerm bû, ez vê helwestê şermzar dikim.

Girêdayî gotinên we, ez dixwazim bipirsim. Bi destpêkirina Doza Sedsalê re, niha gotinên wan rojên dawîn, niha têne nîqaşkirin. Hûn vê yekê çawa dibînin?

✓ Gotina realîteya kurd nayê wateya pervekirina Tirkiyeyê. Binêre. Em ne bolicî ne. Min di konserê de jî got. Ev hezar sal in ku em bi hev re dijîn. Bila em hezar salên din jî bi hev re bijîn. Wekî mirovên vî welatî, em hew çend hatine çespanî, hew çend zilr û zorî li me hatiye kirin, yawo qet nebe kes nikare rabe wisa bibêje: Tevahiya pêkenokan li ser kurdan e, we qet dîtîye ku li ser begzadeyekî Üsküdarê pêkenok hatine gotin? Dêrdê kurdekî tenê jî ne parvekirina Tirkiyeyê ye. Heger hin kesên wisa hebin, ez ne ji wan im. Ez bi tenê dixwazim li Tirkkiyeke azad û demokratîk de bijîm. Lê bi rastî jî, li Tirkkiyeke demokratîk û jî mafên mirovan re hurmetkar e, jî dadgehên engîzîsyon ên Qirna Navîn dût e, li Tirkkiyeke ku mirovan nekuje, darve neke, darizandinên a-dîlane dike, ez dixwazim bijîn.



Di medyaya tirk de spekulasyonên bi rengê ku hûn propagandaya PKK'ê dikin, hunermendên ku bi eslê xwe kurd in, hûn tehdît dikin û dev davêjin malbatên leşkerên ku di şer de jiyana xwe jî dest dane. Hûn jî bo van yekan çî dibêjin?

✓ Na min tu kes tehdît nekiriye. Min propagandaya PKK'ê jî nekiriye. Lewra ez ne PKK'yî me. Lê dijatiya PKK'ê jî ne karê min e. Ez PKK'ê înkâr nakim. Ji ber ku dînamîkeke di nava jiyana de. Mesele îro jî meseleya PKK'ê jî boriye. Li Tirkiyeyê pirsgirêka kurd heye û pêwîst e çareser bibe. Min jî dayikên şehîdan re wisa got: "Bi tenê zarokên we nehatine kuştin. Bi dehhezaran mirov hene ku li serê çiyayan mirine. Dayikên wan jî hene. Heger hûn biratî û aşiyê dixwazin, wan wêneyan li ber sînga xwe deynin, şîn bi tenê tê jiyandin, nayê parvekirin. Bi tenê dayikên windahiyan dikarin wêneyên zarokên xwe li ber sînga xwe bidin û bigerin, lewre goristanên zarokên wan jî ne diyar in. Ne diyar e ku li ku derê hatine veşartin. Ez behsa dayikên tirk dikim. Bêguman dilê wan dişewite. Mirov vê yekê çawa dikare înkâr bike. Lê ya girîng ew e ku ew kesên ku dilê wan li ber

Ez PKK'ê înkâr nakim. Ji ber ku dînamîkeke di nava jiyana de. Mesele îro jî meseleya PKK'ê jî boriye. Li Tirkiyeyê pirsgirêka kurd heye û pêwîst e çareser bibe. Min jî dayikên şehîdan re wisa got: "Bi tenê zarokên we nehatine kuştin. Bi dehhezaran mirov hene ku li serê çiyayan mirine. Dayikên wan jî hene. Heger hûn biratî û aşiyê dixwazin, wan wêneyan li ber sînga xwe deynin, şîn bi tenê tê jiyandin, nayê parvekirin.

van dayikan dişewite, çiqas bi hestiyarî nêzîkî dayikên ku zarokên wan li serê çiya mirine, dibe? Mesel ev e. Lê divê neyê jibîrkirin ku ew mirov beriya ku bîmire, çend kes kuştine.?

Bi taybetî jî bo pêşerojê plan û projeyên we çî ne?

✓ Bêguman projeyên min hene. Mînak; bi navê 'Memleket Hasretî (Bêrîkirina Welêt)' min stranek çêkir. Dixwazim klîba wê li Berlînê bikişînim. Li wê derê ezê demeke kurt bimînim. Ji ber ku di 15 û 16'ê mehê de li Stenbolê mehkemeyên min hene. Heger ez carek din werim vê derê, ango bihêlin ez careke din werim vê derê, tiştên ez bikim, gelek in. Bila bo me alîkariyekê bikin. Bila li me xwedî derkevin ev însan. Bi salan e zilm zilm zilm êdî bes e. Êdî şan û şohret vê zilmê jî ranagire. Mirov rencîde dibe. Êdî me fêhm bikin.

Di kasetaya we ya dawî de stranên kurdî hene?

✓ Straneke bi kurdî heye. Di şeva xelatdayîna de jî min gotibû. Xelatdayîna ku jiyana min di rojekê de serobinokir. Wê rojê yekser Ahmet Kayayê panzdeh salan, li Tirkiyeyê xilas kir. Tevahiya televizyona ambargo daniye ser min. Li kolanan ez rastî kê tîm, sirûda sala dehan 'Onuncu Yıl Marşı' dibêjin. Ezê eynî wisa ji dayika xwe re bibêjim: "Dayê kurê te yê bêwelat, wekî xayînê welat daxuyandin!"

Hûnê hê jî ji çiyayan re stranên bibêjin?

✓ Heta ku ew neheqî bidome, wê Ahmet Kaya ji çiyayan re stranên bibêje.

HEVPEYVÎN: MURAT ALPAVUT / ÖZGÜR POLİTİKA, 9'Ê PÜŞPERA 1999'AN

We got ku xebatên we yên nû hene.